

## Girîngiya wêjeyê

Li seranserê dîroka mirovahiyê, bidestxistina kûrahiya ramanî, hestyarî û giyanî/derûnî bi wêjeyê dest pê dike. Wêje tenê ne wekî qadeke hunerê, ew weke navgîna têgihîştin, derbirîn û veguherîna hebûna takekes a jiyanî, civakî û gerdûnî ye...*Adar Jiyan/R.5*



## Her malek veguheriye kafeyek

Tundiya elektronîk bi awayekî pir berbiçav bandor li têkiliyên malbatî kiriye, bûye sedema pirsgirêkên hevjînan ku wan ber bi hevberdanê ve dibe. Yek ji sedemên zêdebûna dozên civakî yên malbatî û hevjîniyê bikaranîna zêde yan jî şaş...*Sorgul Şêxo/R.2*



## Êşên kurdan, xwe-nasiya tirkan

Gotina fermî di salên destpêkê yên komarê de, yan bi tevahî çanda kurdî paşguh kir an jî ew wekî 'pirsgirêk' û 'gef' bi nav kir. Daxuyaniya 'kurd tune ne, tenê tirkên çiyayî hene' ne tenê îdiayek îdeolojîk bû, di heman demê de... *Prof. Dr. Abdulillah Polat/R.8*


*1 - 7 Kanûn 2025*
*Hejmar:* 311
*Buha:* 20 TL
rojnameyaxwebun@gmail.com

# xwebûn

xwenasîn e


# Sermuzakerevan Abdullah Ocalan e



Nivîskar Adar Gulan der barê hevdîtina komîsyonê ya bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re wiha nivîsî: "Çûyîna komîsyonê ya Îmraliyê, li dinyayê deng veda. Piştî hevdîtina komîsyonê ya bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re pêk hatî û şûnde, hat gotin ku pêvajoya aştî û civaka demokratîk derbasî qonaxeke nû ya avakirina hêza çareseriyê bûye. Eger ku em îro vê hevokê tînin ziman, di wateya erênî de gava hat avêtin girîngiya xwe gelek e. Ev gav ji nişka ve nehatiye avêtin. Di encama ked û têkoşîna Abdullah Ocalan û Tevgera Azadiyê de gelek wateyên xwe yên cuda hene. Piştî vê gava girîng çûyîna komîsyonê ya Îmraliyê û hevdîtina bi rêzdar Ocalan re pêk anî, rê li ber gelek nîqaşên pûç ên di çapemeniya tirk de girt. Çapemeniya tirk ji nîqaşkirina pêvajoyê zêdetir, muxatabgirtina Abdullah Ocalan, bi nîqaşên provakatîf raya giştî gur dikir. Piştî hevdîtina komîsyonê pêşî li ber wan nîqaşan bi tamamî hat girtin. Ruhê pêvajoyê veguherî rengê esasî yê xeta çareseriya demokratîk. Rê li ber nîqaşên spekulatîf bi yek carê hat girtin. Abdullah Ocalan, weke sermuzakerevanê pêvajoya aştî û çareserkirina pirsgireka kurd hat guhdarîkirin. Sermuzakerevanê pêvajoya çareseriyê; Rêber Abdullah Ocalan e..." ***R.8***

## Helwesta li dijî çareseriyê

Tevî redkirina CHPê jî roja 24ê mijdara 2025an, Komîsyona Demokrasî, Xwişk-Biratî û Hevgirtina Millî li girava Îmraliyê û hevdîtineke dîrokî bi Rêber Abdullah Ocalan re pêk anî. Ev hevdîtin, di çarçoveya pêvajoya aştî û civaka demokratîk de, di dîroka nêzîk a komara Tirkiyeyê û Kurdistanê de weke qonaxeke girîng tê dîtin. Heyeta komîsyonê, ku ji endamên AKPê, MHPê û DEM Partiyê pêk dihat, li ser esasê biryara piraniya dengên komîsyonê çû Îmraliyê. CHPê, wek partiyek ku îdia dike sosyal-demokrat e û di nav partiyên mixalefetê de xwedî bandoreke girîng e, bi redkirina çûyîna Îmraliyê gaveke ku ji bingeha xwe ya îdeolojîk dûr dikeve avêt... ***Felemez Ulûg/R.6***

## 'CHP çareseriyê naxwaze'

Parlamenterê HDPê yê berê Îmam Taşçier, helwesta CHPê ya li dijî komîsyonê nirxand û got: "Beriya komîsyon ava bibe, PKKê xwe fesih kir. CHPê xwest komîsyon ava bibe. Piştre li gorî daxwaza CHPê komîsyon hat avakirin. Lê ji roja komîsyon hat avakirin heta îro, 11 parlamenterên di komîsyonê de bê dilê xwe tevgeriyan. Herî dawî dema komîsyonê biryar girt ku biçe Îmraliyê, vê carê CHPê astengî derxist. Ji bo şeklê çareseriyê û demokratîkbûna pêvajoyê divê bi Ocalan re hevdîtin bihata kirin ji ber ku muxata ew e. Ji ber ku xwediyê vê fikrê ew e, bi awayekî xwezayî divê CHP jî di nav komîsyonê de biçûya serdana birêz Ocalan bikira... ***R.3***

## Azadiya fîzîkî dê rêya aştiyê vebike

Nivîskar Mehmet Karakuş der barê pêvajoyê de got: "Dewletê hê li ser çareserkirina pirsgirêkê biryara xwe nedaye. Hin amadekariyên wan ên aşkerenekirî hene. Ev nêzîkatiya dewletê pirsgirêkê asê dike. Xwe giran dikin û dixwazin demê dirêj bikin. Bi taybetî jî, kakilê pêvajoyê û xala wê ya werçerxê Rojava ye. Piştî ku statuya Rojava diyar bû, dewlet dê biryara xwe bide. Heta hingê dê xwe giran bike. Dê hin taktîkan biceribîne ku eleqeya wan bi pêvajoyê re nîne. Ji ber van sedeman azadiya fîzîkî ya Serokatiyê asteng dikin."



Mehmet Karakuş di berdewamiya axaftina xwe de got:"Em bawer dikin ku azadiya fîzîkî ya Serokatiyê pêk bê, dê pêvajo pir bi lez bi pêş bikeve. Ji ber hindê, çavên wan li pêşketinên li herêmê, bi taybetî jî li misogeriya statuya Rojava ye. Di dîrokê de sê caran wan em, kurd, egle kirine û xapandine. Dibêjin em îcar jî dikarin wan bixapînin. Ew jî dizanin ew bêyî kurdan nikarin ti tiştekî bikin. Di dîrokê de jî her tim bi kurdan re tifaq kirine û her carê jî li dijî ruhê tifaqan tevgeriyane û xwe ji wan kêşeyan rizgar kirine... ***Hevpeyvîna Xecê Şen/R.4***

## Yew şar gandar beno

Sere de Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalan heme şorişgeran armanc kerd ke şarê kurdî azad bikerê. Seba nê armancî bedelê pîlî dayî. Mîsal Mazlum Doganî zîndanê Amedî de leşa xo vêşnaye. Seba ke erdê Kurdîstanî ***"koloni"*** nêbo, seba ke şaro kurd ***"bende"*** nêbo, seba ke kamîye û kulturê kurdan teslîmê asîmîlasyonî nêbo, ey cuya xo ra fek vera da. Ey verê zulmkarî de zanîyê xo nêronayî. Ey hertim wina vatêne: ***"Armancê ma yo tewr tay xoserî ya".*** Ey giranîye dayêne xoserîya şarê kurdî. Ey zanêne ke zulmkarî... ***R.9***

## Hebûn û vejîn

Rêber Apo bi banga 27ê Sibata 2024an xwest PKK xwe bi awayekî dilxwaz fesih bike. Got; dewra wê temam bûye, karê xwe kiriye, peywira xwe aniye cih. Got; PKKê hebûn misoger kir û dora azadiyê ye. PKKê jî bi telîmat û perpektîfên Rêber Apo bi birêvebirina wî gulana 2025an kongreya xwe ya awarete ya 12an çêkir û rêxistina xwe fesix kir. Desthilatdarên tirk ji bo dawî li PKKê bînin, sala 84an 72 saet dem nîşan didan. Bi sedan 72 saet derbas bûn, bi dehan desthilatdar û sererkanên dagirker ji holê rabûn. Lê 47 sal in PKK bi ruhê di nav gelê kurd û bindestan de ava kirî her zindî ye. Ew navê hebûna gelê kurd çêkera Cejna Berxwedana Neteweyî ye... ***Ramazan Olçen/R.7***

# Her malek veguheriye kafeyên înternetê

Tundiya elektronîk bi awayekî pir berbiçav bandor li têkiliyên malbatî kiriye, bûye sedema pirsgirêkên hevjînan ku wan ber bi hevberdanê ve dibe. Yek ji sedemên zêdebûna dozên civakî yên malbatî û hevjîniyê bikaranîna zêde yan jî şaş a înternetê ye



Sorgul Şêxo

Cîhan di dehsalên dawî de şahidiya şoreşek dîjîtal a mezin kiriye. Ev diyarde bandorê zêdetir li jinan dike û xeteriyên mezintir bi xwe re diafirîne. Tundiya dîjîtal a li dijî jinan tacîza cinsî, parvekirina bêdestûr a wêne yan dîmenên kesane, gef û îstîsmara devkî pêk tîne. Ev dibe sedema zirara psîkolojîk, laşî û civakî ya demdirêj û jinan ji beşdarbûna di cîhana dîjîtal de yan jî xwe bi azadî îfade kirin bêtir ditirsîne.

**Xeterî û tundiya dîjîtal li ser jinan**

Xeteriya tundiya dîjîtal a li dijî jinan di xwezaya xwe de piralî ye û pir caran bêdeng û veşartî dimîne. Berovajî tundiya kevneşopî, ew şopên fizîkî yên rasterast nahêle, lê birînên kûr ên psîkolojîk çêdike, di nav de fikar, depresyon, wendakirina baweriya bi xwe, vekişîna civakî, hestên bêçareseriyê û stîgmayê diafirîne. Bandora wê dikare bigihîje jiyana rastîn, bibe sedema wendakirina kar, kêmkirina beşdariya civakê yan jî têkbirina têkiliyên civakî. Ev yek tundiya dîjîtal dike amûrek bihêz ji bo kontrol û zordariyê. Gelek caran ji bo van dozan encamên qanûnî yên rasterast dernakevin.

Ji ber vê yekê aşkere ye ku tundiya dîjîtal a li dijî jinan ne tenê tacîza elektronîk a demkî ye. Ew diyardeyek civakî, psîkolojîk û qanûnî ya tevlihev e ku bandorê li ewlehiya kesane, xweseriyê, wekheviya zayendî û civakê bi tevahî dike. Lêkolîna vê diyardeyê û analîzkirina pîvanên wê gavek girîng e ber bi têgihîştina mekanîzmayên kontrol û îstîsmara dîjîtal, parastina jinan û hêzdarkirina wan ji bo bikaranîna teknolojiyê bi ewlehî û erênî, bi vî rengî pêşketina civakê û bidestxistina edalet û wekheviya zayendî bi pêş dixe.

**Bandora li malbatê**

Tundiya elektronîk bi awayekî pir berbiçav bandor li têkiliyên malbatî kiriye, bûye sedema pirsgirêkên hevjînan ku wan ber bi hevberdanê ve dibe. Yek ji sedemên zêdebûna dozên civakî yên malbatî û hevjîniyê bikaranîna zêde yan jî şaş a înternetê ye. Bandora bikaranîna zêde ya înternêtê bandorê li jiyana kesan di malbatê de dike, zarokan ji zaroktiyê qut dikin, jinan ji jiyana civakî dûr dixe û hevjînan dûrî hev dike ku derfetên danûstandinê jî kêm dibin, ev dihêle ku malbat ji hev bikeve.

Ev cureyek tundiyê ya herî xeternak e. Her malek veguheriye kafeyên înternetê yên biçûk. Bifikire ku hemû endamên malbatê telefonê bi kar tînin. Teknolojî bûye ferdek li malbatê, ev rastiyek ku nabe neyê dîtin û gotin. Dema ku diçin mêvandariyê ew û yên mêvan serî di telefonan de û rûniştina wan bênîqaş derbas dibe. Mêvandariyên bêmêvanên rasteqîn. Înternêtê bandorek wiha kiriye ku saetek kesek bê telefon nikare bijî. Têkiliyên civakî li aliyekî lê li aliyê din pirsgirêkek cidî heye ku doza zewaca di temenê zaroktiyê de yek ji bandora vê tundiyê ye.

**Gera li hezkirinê!**

Zarokên keç bi biçûkanî tên zewicandin, derfeta ku keç temenê xwe bijî, xwe nas bike û dora xwe fêm bike jê tê standin. Dema ku ew keç an jî xort mezin dibe û dikeve pêvajoya naskirina xwe û derdorê, dikevin gera li hezkirina rastîn. Gera li hezkirina piştî zewaca zaroktiyê bûye sedem ku tundî zêde dibe, hevjîn li derveyî jiyana hevjîniyê li hezkirinê bigerin, ev dozên hevberdanê zêde dike û îxanetê bêsînor dike.

**Hemû berpirsyariyan li jinan bar dikin**

Ji bo wê tundiya elektronîk tundiya herî bibandor a nayê dîtin e. Mêr an hevjîn li malê, li kolanê û her derê ji mijûlbûna bi telefonê re derdora xwe ji bîr dikin, hemû berpirsyariyan diavêjin ser milê jinan û dîsa xwe wekî berpirsyar dibînin. Gava ku zarok an kesek zirarekê dibîne, jin û dayikan sûcdar dikin bêyî ku bizanibin rola wan di vê bûyerê de çi ye. Teknolojiya ku bûye beşek girîng ji civakê divê bi zanebûn were bikaranîn.

**Xweziya bi rojên berê**

Herkes xweziya xwe bi roj û zemanê berê tîne, gava herkes li dora sobeyê kom dibûn û li çîrokên dapîrên xwe guhdarî dikirin û hewayek germ û hevgirtî çêdibû, heta xew bi tahm bû. Demên ku herkes li hev guhdarî dikir, êşên hev fêm dikirin û pêwîstî bi qêrînê nedidîtin. Niha bûye ku kes li kesî guhdarî nake û êş û azarên wê/î fêm nake û jê direve da ku guhdar neke, ji ber ku ji gundarîkirinê zû diwestin. Gotina çîrokan û serpêhatiyan êdî şevên niha germ nake, ji ber nayê gotin. Çîrokên li ser medyayê tê guhdarîkirin û gelek caran nayên guhdarîkirin û dibe ku rastiyên dîrokî jî werin berovajîkirin. Çîrokên ji devê dapîran dihatin der û derbasî nifşan dibûn, rastiyek wê hebû her çiqas xeyalî jî be.

**Parvekirin li ser medyaya civakî ne**

Loma piraniya kesan berê xwe didin malperên medyaya civakî û li wir hewl didin bi rêya postan pirsgirêkên xwe ne bi zelalî jî be, binivîsin bêyî ku çareseriya wan bibînin. Pirsgirêk di rastiyê de pir in lê li ser medyaya civakî li çareseriya wan digerin. Malperên medyaya civakî civak li dora xwe kom kirine û civakbûyîn lawaz kiriye.

Rîskên ku dikarin ewlehiya zarok tehdît bikin, dikarin wî bi îstîsmar, tundûtûjî yan îstismarê re rû bi rû bihêlin. Ev yek di tenduristî, pêşkeftina laşî û derûnî û hevsengiya derûnî ya zarok de xuya dibe. Lê ne niha di dema ku roj bi roj mezin dibe.

**Gera li çareseriyan**

Ne tenê zarok, jin û hemû endamên civakê pêwîstiyê bi hişyarbûnê nabînin, lê ev xalek girîng e ku pêwîst e herkes li çareseriyan bigere, an wê di çend salên pêş de mirov ji mirovbûna xwe dûr bikevin. Civakên ber bi azadiyê ve dimeşin, daxwaza edalet û wekheviyê dikin, divê ku pirsgirêk û tundiyên wiha bibînin û çareseriyan zûtir biafirînin.



Xecê Şen

# ‘Xeta azadiya jinan xeteke jêneger a jiyanê ye’

Em têkildarî rêzeçalakiyên TJAyê yên 25ê mijdarê ku li seranserê Kurdistan û Tirkiyeyê pêkanîn û astengiyên ku dewletê derxistin ber çalakvanan û li hember hemû astengiyan berxwedan û têkoşîna jinan bi endama TJAyê Fîdan Çîmenê re axivîn.

Çîmen Fîdan di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser çalakiyên cihêreng ên TJAyê yên 25ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li ser Jinan a Navneteweyî ku li seranserê Kurdistan û Tirkiyeyê pêk hatin wiha got: “Wek TJA em her sal 25ê Mijdarê bi çalakiyên cur bi cur pêşwazî dikin. Me îsal jî li sersanserê Kurdistan û Tirkiyeyê bi dirûşma ‘Bi Civaka Demokratîk Ber bi Jiyana Azad a Bê Tundî Ve’ pêşwazî kir û me çalakiyên cihêreng li dar xistin.”

**‘Divê heqîqet derkeve holê’**

Çîmen Fîdan li ser peyamên jinan ên ku di roja meş û çalakiyên 25ê Mijdarê de derketin pêş ev tişt anî ziman: “Di meş û çalakiyên me de peyama ku ‘em tundiya li ser jinan qebûl nakin û sînorên ku ji aliyê aqilê mêran ve hatine danîn jî nas nakin derket pêş’. Ji bo kuştinên jinan ên biguman helwesteke baş derket holê. Ti kuştin bêguman nîn e, her kuştineke jinekê biguman e û divê demildest kujerên wan bên aşkerekirin û cezakirin. Lewra bêdengiya dewletê ya li hemberî kuştina jinan, dibe sedem ku her roj kuştina jin û zarokan zêdetir bibe. Di vî warî de aqûbeta Rojîn Kabaîş, Narîn Guran, Gulistan Doku û Îpek Er hatin pirsîn û jinan li dijî polîtîkayên şerê taybet jî ev tişt anîn ziman got ku ew kuştina jinan qebûl nakin û dê heta dawî ji bo heqîqetê têbikoşin û di wê baweriyê de ne ku em ê bi ser bikevin.”

**‘Jinan hesabê kuştinên biguman pirsî’**

Çîmen Fîdan li ser qirkirin û talankirina xwezayê ji bo parastina wê plansaziyên ku kiribûn wiha got: “Me di çarçoveya plansaziya 25ê Mijdarê de ji bo qirkirina li ser xwezayê û jiyana ekolojîk jî gelek rêzeçalakiyên wek dar çandin, vekirina parkên jinan, li ser jiyana ekolojîk û civaka demokratîk perwerdehî û çalakiyên cihêreng li dar xistin. Me bi jinan re li gelek tax, gund û bajaran de civîn, komcivîn pêk anîn û me xebatên hêja da meşandin. Herwiha li dijî hişbir, fihûş, tacîz û tecawizê me çalakî li dar xist û li aqûbeta Rojîn Kabaîş û Narîn Guranê pirsî.”

**‘Perwerdehî bingeha jiyana azad e’**

Çîmen Fîdan destnîşan kir ku plansaziya 25ê Mijdarê ne tenê rêzeçalakî, meş û komcivîn bûn, herwiha gelek atolyeyên perwerdehiyê jî hatin lidarxistin û wiha domand: “Li ser hişmendiya mêr, kesayet û taybetmendiya kesayeta mêr û têkoşîna li dijî vê hişmedniyê perwerdehî hat dayîn. Bi nêrîna jineolojiyê guhertin û veguhertina mêran dê çawa pêk were hat nîqaşkirin. Tundiya ku li jin û zarokan tê kirin, wek mirov bandoreke çawa li ser mêran dike? Dema ku jinek rastî tundiya mêran tê yan jî tê kuştin mêrên din xwe çawa hîs dikin û hesteke çawa bi wan re çêdibe hwd. Me bi gelek mijarên cur bi cur mêr perwerde kirin. Ya herî girîng jî perwerdehiya li ser civaka demokratîk û jiyana komunal bû. Ji ber ku serdema nû ya avakirina civaka demokratîk dê bi pêşengiya jinan û li ser esasê fikir û azadiya jinan bê avakirin.”

**‘Jin sînoran nas nakin’**

Çîmen Fîdan li ser meşên fînalê yên TJAyê û nêzîkatiya dewletê ya li hember 25ê Mijdarê jî ev tişt anî ziman: “Wek TJA me di roja 25ê Mijdarê de bi gelek platformên jinan ên bajaran re hevpar çalakiyên wek meş, panel, komxebat li dar xistin û meşên fînalê pêk anîn. Her çiqas em di pêvajoyeke aştî ya çareseriya demokratîk de bin jî, mixabin bêtehemuliya dewletê û unîformayiyên wan wek her carê rengê xwe diyar kir. Polîsên dewletê li gelek bajaran meş û çalakiyên me asteng kirin û nehiştin meşên me pêk werin. Bi taybet li bajarê Şirnexê. Lê jinan sînor nas nekirin.”



Çîmen Fîdan herî dawî nêrîna TJAyê ya li ser mijara mafê hêviyê yê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan anî ziman ku ew ê li ser xeta azadiya jianan ji bo vê têbikoşin û wiha got: “Em wek TJA, pêşengiya Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk dikin ku bi banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hatiye destpêkirin. Em ê ji bo vê jî têkoşîneke bêhempa bidin. Ji ber vê yekê em dibêjin ‘Xeta azadiya jinan ji bo me xeteke jêneger a jiyanê ye’. Em di vê wateyê de rizgarî û azadiya hemû mirovahiyê di xeta azadiya jinan de dibînin. Bi vê mebestê em ê di serî de ji bo pêkhatina biryara mafê hêviyê têkoşîneke bêhempa bidin. Herwiha ji bo bipêşxistin û parastina xeta azadiya jinan, ji bo jiyaneke ekolojîk û azadiya xwezayê ya hemû mirovahiyê heta hetayê têbikoşin.”

# Li Ewropayê qedexe li Tirkiyeyê serbest e

**Welatên Ewropayê ji bo pêşketina mêjiyê zarokan û liv û tevgera wan, telefonan li zarokan qedexe dikin. Danîmarkayê li zarokên heta 15 salî telefon qedexe kir. Lê li Tirkiyeyê bikaranîna telefonan ji bo zarokan serbest e**

| Gabrîel Başo

Li gorî nûçeyên ajansên neteweyî heta 6 mehên ewil ên 2025an ji 8.2 milyar nifûsa cîhanê 7.4 milyar mirov telefonên biaqil bi kar tînin. Ev jî nîşan dide ku li cîhanê ji sedî 85-87ê mirovan telefonên biaqil bikar tînin.

Li Tirkiyeyê telefonên biaqil îro ji sedî 90 li destê her kesî ye. Bi taybetî dayik û bav ji bo zarokên xwe bêdeng bikin û zêde bi zarokên xwe re mijûl nebin, telefonan dixin destê zarokên xwe û zarokan bi telefonan aş dikin.

Şîrketên telefonan, ji xizmeta ragihandinê zêdetir bernameyên ku zarokan bi xwe ve gire bidin bar dikin û hiş û aqilê zarokan didizin. Ji bo şîrketên telefonan, piyase çiqas zêde telefonan bixwaze, ewqas li karê ne. Lê kesên telefonan distînin ji pêdiviyê zêdetir li dijî pêdiviyan bi kar tînin. Herî zêde zarok dikevin kemîn û kozika van telefonan. Lê dayik û bavên zarokan tenê temaşe dikin.

**Ewropa telefonan qedexe dike**


Ajansên neteweyî balê dikişînin ser helwesta welatên Ewropayê ya li dijî zarokên ku telefonan bi kar tînin. Welatên endamên Parlamentoya Ewropayê (PE), bang li Yekîtiya Ewropa (YE) dikin ku temenê bikaranîna medyaya dijîtal/civakî bibe 16 sal. PE dixwaze ku zarok heta 16 saliya xwe medyaya dijîtal bikar neynin.

Li gorî lêkolînan zarokên ku li dibistanê û malê telefonan bi kar tînin ji dersên xwe kêm dimînin û ji civakîbûna xwe dûr dikevin. Li gorî lêkolînan ji ber ku telefon zerarê dide zarokan, Kraliyeta Yekbûyî û Almanyayê bikaranîna telefonan û amûrên tijîtal, li polan li zarokan qedexe kir.

Dîsa welatên wek Hollanda, Fransa û Norveçê telefon û cîhazên dijîtal li polên dibistanê qedexe kir. Pispor destnîşan dikin ku zarok çiqas zêde telefonê bi kar bînin, ew qas hişê wan kêm dibe û bandoneke neyînî li ser liv û tevgera wan dibe. Dîsa hestên wan ên civakî û xwezayî ji hev qut dibin.

Her wiha hikûmeta Danîmarkayê, meha mijdara vê salê, ji bo zarokên heta 15 salî peymaneke siyasî aşkere kir. Li gorî vê peymanê divê zarok heta 15 salî medyaya dijîtal bi kar neynin.

Serokê Danîmarkayê Mette Frederiksen, telefona biaqil wekî cinawir pênase dike. Mette Frederiskon destnîşan dike ku telefon û medyaya dijîtal zaroktiya zarokan ji wan didize. Dîsa bi bîr dixe ku zarokên temenê wan 11-19 salî û telefonê bi kar tînin ji çand û ruhê civakbûnê dûr dikevin.a



**Ên herî zêde telefonê bikar tînin**

Zanîngeha McGill ku li Kanadayê ye, ji 2014an heta 2020an, li hemû cîhanê raporek amade kir. Li gorî raporê welatê herî zêde telefonê bi kar tîne Çîn e; welatê duyemîn Erebistana Siûdî, Tirkiye di rêza 8emîn, DYA 18emîn, Fransa ji dawiyê rêza 2yemîn û Almanya jî di rêza herî dawî de ye. Li gorî lêkolînê Almanya û piştre Fransa ew welat in ku herî kêm telefon tê bikaranîn.

**Ji sedî 70 zarok telefonê bi kar tînin**

Li gorî lêkolîna TUÎKê ya 2024an, li Tirkiyeyê, ji sedî 90,3- 92,2yê zarokan înternetê bi kar tînin. Sala 2021ê, bikaranîna înternetê ya zarokan ji sedî 82,7 bû. Ev rêje, sala 2024an, gihîşt ji sedî 91,3yî. Li gorî lêkolînê, ji sedî 76,1ê zarokan telefonên biaqil bi kar tînin.

# Ciwan dixwazin fikrên Ocalan ji wî bibihîzin

| Navenda Nûçeyan

Endamê Meclisa Ciwanan a DEM Partiyê Rêzan Kaganarslan, anî ziman ku armanca şandeya ciwanên Başûr ew e ku yekser fikrên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji wî bibihîzin û li her derê belav bikin.

Ciwanên endamên Partiya Zahmetkêşên Kurdistanê û Partiya Sosyalîst a Kurdistanê, ji bo pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk, ji herêma Federe ya Kurdistanê hatin bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê. Ciwanan li Amed, Riha, Mêrdîn û Enqereyê hevdîtin kirin. Ciwanan ji bo bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikin daxwazname da Wezareta Dadê. Endamê Meclisa Ciwanan a DEM Partiyê Rêzan Kaganarslan, têkildarî armanca daxwaznameyê û pêvajoyê wiha got: "Ciwanan bi vê serlêdanê xwest ku rasterast yekser fikr û ramanên birêz Ocalan ên li ser pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ji wî bibihîzin."

**Qedera dîrokê girêdayî Ocalan e**

Rêzan Kaganarslan da zanîn ku ciwan dixwazin li ser fikrên Abdullah Ocalan ên Yekîtiya Neteweyî ku di manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk de qal dike, nîqaş bikin û wiha axivî: "Me xwest ku ev şande bi birêz Ocalan re hevdîtin bike, da ku fikrên wî yên li ser ciwanên ku li dijî ferasета mêrane û desthilatê têdikoşin fêr bibin. Me xwest ku di dîroka kurdan de, têkoşîna kurdan ne li ser sehpaya darizandinê, li ser maseyê bi hevdîtinê bi dawî bibe. Me xwest nîşan bidin ku ji çar parçeyên Kurdistanê dê dîsa ciwan pêşengiya vê yekê bikin. Ji bo ev gava dîrokî bigihîje encamê qedera vê dîrokê jî girêdayî rewşa rêzdar Abdullah Ocalan e. Ciwanan li vir bal kişand ser muxatabî û aktoriya rêzdar Ocalan."

**Xwestin Ocalan di nav civakê de be**

Rêzan Kaganarslan da zanîn ku şandeyê xwestiye Abdullah Ocalan azad bibe û têkeve nav civaka xwe û wiha pêde çû: "Ciwanan xwest ku xebatên xwe yên siyasî bi awayekî azad pêk bîne. Ciwanan li bajarên Mêrdîn, Riha û Amedê hevdîtin kirin. Di van hevdîtinan de jî li ser rewşa bakurê Kurdistanê û asta rêxistinbûnê rawestiyan. Me tecrûbeyên xwe yên li ser rêxistinbûna ciwanan parve kirin. Me ramanên birêz Ocalan ên li ser mêrên serdest jî bi wan re parve kirin. Me xwest ciwanên Başûr jî ji vê serpêhatiyê sûdê werbigirin. Endamên şandeyê jî qala rewşa ciwanên Başûr kir. Qala bandora banga Aştî û Civaka Demokratîk a li ser Başûr kir. Ciwanên Başûr jî bal kişand ser rol û muxatabiya birêz Ocalan a dîrokî ya li ser pêvajoyê."

Rêzan Kaganarslan, bi bîr xist ku heta niha wezareta dadê bersiva serlêdanên din nedaye û wiha lê zêde kir: "Me serî li Wezareta Dadê da. Rayedaran tenê daxwazname ji me girt û got, "Eger bersiv bê hûn dikarin li ser vê nimrê bişopînin. Wekî din ti bersiv nedan. Berê ciwaên ji Ewropayê hatibûn û şandeyên din jî ku hatibûn û serî li Wezareta Dadê dabûn, hê jî bersiveke erênî negirtine. Eger ev serlêdan bê qebûlkirin û derfet bê dayîn ku ciwanên Başûr biçin Îmraliyê, mijara bê axaftin helbet mijara Kurdistanê ye. Mijara pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk e."

Rêzan Kaganarslan diyar kir ku ciwanên Başûr li ser manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk hûr dibin û got: "Ciwanên Başûr hewl didin ku bibin bersiva vê bangê. Wekî ku birêz Ocalan jî pênase dike, sosyalîzma demokratîk tê çi wateyê, wê li ser vê mijarê nîqaş bikin. Ciwanên ku ji Başûr hatine, endamên Partiya Zahmetkêşan û Partiya Sosyalist a Demokrat in. Dixwazin bi rêxistinbûna kurdan û Rêxistinbûna Neteweyî bigihînin civakbûnê. Dixwazin bi civakbûnê jî bigihîjin sosyalizmeke demokratîk. Ciwan dixwazin li ser van mijaran bi birêz Ocalan re hevdîtinê bikin."

Rêzan Kaganarslan herî dawî wiha axivî: "Bajarê ku me lê daxwazname da, bajarekî ku birêz Ocalan û 7 hevalên xwe lê tevgera azadiyê daye destpêkirin e. Dîsa 27ê mijdarê jî salvegera îlankirina partiyê ye ku birêz Ocalan û hevalên xwe ava kiriye. Me xwest li ser girîngî û wateya vê rojê jî pirsan ji birêz Ocalan bikin. Me xwest pêşniyarên birêz Ocalan ên li ser ciwanên çar parçeyên Kurdistanê werbigirin."



# CHP çareseriyê naxwaze

| Yilmaz Yilmaz

Siyasetmedar û parlamenterê HDPê yê berê Îmam Taşçier, helwesta CHPê ya li dijî komîsyonê nirxand û wiha got: "Beriya komîsyon ava bibe, PKKê xwe fesix kir. Çek şewitandin. CHPê xwest komîsyon ava bibe, di komîsyonê de cih bigirin û her tişt zelal pêk bê. Piştre li gorî daxwaza CHPê komîsyon hat avakirin. Lê ji roja komîsyon hat avakirin heta îro, 11 parlamenterên di komîsyonê de bê dilê xwe tev geriyan. Herî dawî dema komîsyonê biryar girt ku biçe Îmraliyê, vê carê CHPê astengî derxist. Çima CHPê astengî derxist? Ji ber ku ev gav piştî 27ê sibatê ji aliyê birêz Abdullah Ocalan ve hatiye avêtin. Ji bo şeklê çareseriyê û demokratîkbûna pêvajoyê divê bi birêz Abdullah Ocalan re hevdîtin bê kirin û fikrên wî bên wergirtin. Ji ber ku xwediyê projeyê û muxatabê li ser masê birêz Ocalan e. Ji ber ku xwediyê vê fikrê ew e, bi awayekî xwezayî divê CHP jî di nav komîsyonê de biçûya serdana birêz Ocalan bikira.

**Diviyabû 51 wekîl çûbûna Îmraliyê**

Îmam Taşçier, destnîşan kir ku ne tenê nûnerên komîsyonê û CHPê, diviya bû 51 endamên komîsyonê çûbûna Îmraliyê û bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtin kiribûna û wiha got: "Diviyabû 51 endamên komîsyonê çûbûna Îmraliyê û her tişt li wir zelal kiribûna. Lê tenê her partiyê nûnerên xwe yên komîsyonê şandin. Dîsa jî CHPê astengî derxist û beşdarî şandeya komîsyonê nebû. CHPê nexwest çareseriya pirsgirêka kurdî û projeya birêz Ocalan bên nîqaşkirin. Ji ber vê yekê çûna Îmraliyê red kir. Nexwest ev mesele bên ser maseyê. Dijberî vê helwestê diviyabû CHPê wekî partiya muxalefetê zor bida îktîdarê ku gavan bavêje. Diviyabû CHPê di çûna 51 endamên komîsyonê de israr bikira û bixwesta ku fikrên birêz Ocalan jî bistînin."

**CHPê her dem li dijî kurdan cih girtiye**

Îmam Taşçier, li ser helwesta CHPê ya li dijî pirsgirêka kurdî jî rawestiya û wiha axivî: "Di dema Mustafa Kemal de, di dema Îsmet Înonu de, di dema Bulent Ececît de û di dema Kemal Kiliçdaroglu de her demê, CHPê li dijî çareseriya pirsgirêka kurdî cih girtiye. Kî bûye desthilat, her dem li dijî kurdan li ser dijminatiya kurdan CHPê li cem desthilatê cih girtiye. Herî dawî, 2016, dema HDP li meclisê bû û ji bo li 67 parlamenterên wê lêpirsîn bê vekirin, ji bo di makezagona Tirkiyeyê de guhertinê çêbikin ji bo AKP û MHPê 10 wekîl lazim bûn. Lê CHPê li şûna 10 wekîlan 20 wekîl dan û kir ku rê li pêşiya girtina Selehatîn Demîrtaş û 20 wekîlên din bê vekirin. Piştî wê guhertinê, Erdogan bû serokkomarê Tirkiyeyê. Bi hevkariya MHP û CHPê xwestin Tirkiyeyê bi rê ve bibin.

**Aqilê CHPê hîn yê 1923an e**

Îmam Taşçier, got ku wê demê jî armanca CHPê ew bû ku HDP an bê girtin an jî lawaz bibe û wiha axivî: "Lê hesabê CHPê pêk nehat. CHPê di dîroka xwe de ji bo çareseriya pirsgirêka kurdî ti gaveke erênî neavêtiye. CHPê di pêvajoya 2013-2015an de jî astengî derxist. Îro jî dixwaze astengiyê derbixe. Ji ber ku CHP partiyeke nijadperest e. Ew dixwaze xwe demokrat nîşan bide, lê ne wisa ye. CHP xwe wekî notirvanê komarê nîşan dide. Armanca wê ku bibe îktîdar tune ye. Mejiyê CHPê hîn mejiyê Îttihat Terakkiyê ye. Rojhilata Navîn û cîhan hatiye guhertin, lê aqilê CHPê yê 1923an e. Li Başûr Herêma Federe hatiye avakirin. Li Rojava Rêveberiya Xweser hatiye avakirin. Li Îranê xebatên nû hene. Kurd di her alî de bûne xwedî hêz. Bûne xwedî partî û rêxistin. Kurd li her derê xwedî yek helwestê in. Kurd dixwazin li ser axa xwe, xwe bi rê ve bibin. Lê CHP vê yekê naxwaze. CHPê hîn nasname û zimanê kurdî qebûl nekiriye. Dixwaze mafên kurdan ên kolektîf bi awayekî fermî çênebin. Tenê dixwazin kurd li mala xwe bi kurdî biaxivin. Dixwazin kurd bi nasnameya xwe siyasetê nekin û ne xwedî maf bin. Lê êdî kurd nayên xapandin. Kurd êdî dizanin kî dost e û kî ne dost e. Kurd êdî di her alî de xwedî sazî û rêxistin in. Dixwazin di her alî de mafên xwe biparêzin. Kurdan heta niha ti carê sitû xwar nekiriye. Projeyên birêz Ocalan ên niha jî bi rastî ji bo mafên kurdan û demokratîkbûna Tirkiyeyê rê vedike. Lê CHP naxwaze rêya demokrasiyê li Tirkiyeyê bê vekirin. Heta ku pirsgirêka kurdî çareser nebe, demokrasî jî nayê Tirkiyeyê."

## ÇARESERÎ ENTEGRASYONA POZÎTÎF E

# Azadî dê rêya aştiyê vebike

Xece Şen

*Nivîskar Mehmet Karakuş diyar kir ku azadiya fizîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêk bê, dê pêvajo bi lez bi pêş bikeve û got: "Dewlet siyaseta înkarê dimeşîne. Lê li dijî vê yekê Rêber Abdullah Ocalan bi pêşniyara entegrasyona pozîtîf civaka aştî û demokratîk esas digire."*

*Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, 27ê sibatê, banga "Aştî û Civaka Demokratîk" kir. Li ser banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan PKKê 5 û 7ê gulanê kongreya xwe ya 12emîn li dar xist. Biryara xwefesixkirinê girt. Piştî 11ê tîrmehê jî komeke gerîla bi pêşengiya hevseroka KCKê Besê Hozat, li Şikefta Caseneyê ya Silêmaniyê bi merasîmekê çekên xwe şewitandin. 26ê cotmehê jî hemû hêzên xwe yên gêrîla ji Tirkiyeyê vekişandin. Lê dewletê heta niha gavên hiqûqî û siyasî neavêtine. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di banga 27ê sibatê de entegrasyona pozîtif pêşniyar dike. Li ser pêvajoya aştî û çareseriya demoratîk, mafê hêviyê û entegrasyonê bi nivîsar Mehmet Karakuş axivîn ku ew 30 salan di girtîgehê de mabû.*



Nivîskar Mehmet Karakuş diyar kir ku azadiya fizîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêk bê, dê pêvajo bi lez bi pêş bikeve û got: "Dewlet siyaseta înkarê dimeşîne. Lê li dijî vê yekê Rêber Abdullah Ocalan bi pêşniyara entegrasyona pozîtîf civaka aştî û demokratîk esas digire."

***Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, 27ê sibatê, banga Aştî û Civaka Demokratîk kir. Ji wê rojê heta niha di pêvajoyê de çi pêşketin pêk hatin?***

Dewletê hê li ser çareserkirina pirsgirêkê biryara xwe nedaye. Hin amadekariyên wan ên aşkerenekirî hene. Ev nêzîkatiya dewletê pirsgirêkê asê dike. Xwe giran dikin û dixwazin demê dirêj bikin. Bi taybetî jî, kakilê pêvajoyê û xala wê ya werçerxê Rojava ye. Piştî ku statuya Rojava diyar bû, dewlet dê biryara xwe bide. Heta hingê dê xwe giran bike. Dê hin taktîkan biceribîne ku eleqeya wan bi pêvajoyê re nîne. Ji ber van sedeman azadiya fizîkî ya Serokatiyê asteng dikin. Em bawer dikin ku azadiya fizîkî ya Serokatiyê pêk bê, dê pêvajo pir bi lez bi pêş bikeve. Ji ber hindê, çavên wan li pêşketinên li herêmê, bi taybetî jî li misogeriya statuya Rojava ye. Di dîrokê de sê caran wan em, kurd, egle kirine û xapandine. Dibêjin em îcar jî dikarin wan bixapînin. Ew jî dizanin ew bêyî kurdan nikarin ti tiştekî bikin. Di dîrokê de jî her tim bi kurdan re tifaq kirine û her carê jî li dijî ruhê tifaqan tevgeriyane û xwe ji wan kêşeyan rizgar kirine.

***Hûn vê pêvajoyê li gorî pêvajoyên berê çawa şîrove dikin? Cudahiya niha ji pêvajoya 2013/2015an çi ye?***

Ev pêvajo bi banga Serokatiyê ya Aştî û Civaka Demokratîk dest pê kir. Ferqa wê ji yên berê ew e ku şert ji hev cuda ne. Ya herî giring jî, vê pêvajoyê di mercên Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de dest pê kiriye. Li aliyekî, têkoşîn û pêkola ji bo serdestiya hegemonîk a di navbera Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYE) û Çînê de, li aliyê din, şerê ji bo elementên axê yên hindik û li hêleke dîtir jî, guhartinên di rêyên enerjiyê de rûdayî vê cudahiyê derdixin holê. Nexasim jî, di vê çarçoveyê de jinûvedîzaynkirina herêmê yek ji cudahiyên sereke ye ku vê pêvajoyê ji yên din cihê dike. Hêzên rojavayî û hêzên DYAyê yên navendî hewl didin ku avasaziya netewe-dewletên klasîk ên wekî Tirkiye û Îranê bisînor bikin û bi awayekî jî veguherînin. Ew pêvajoya ku bi Iraqa federal dest pê kiriye, ew dixwazin wê bi Sûriyeya federal, Tirkiyeya federal û Îrana federal bibin serî û Îsraîlê bikin yekane hêza hegemonîk. Hebûna hewldaneke bi vî rengî kiriye ku ev pêvajo pêk were û bimeşe. Jixwe li destpêka vê pêvajoyê em dizanin ku şîret li Tirkiyeyê hatine kirin ku pirsgirêka xwe ya kurdî çareser bike.

Serok û Tevgera Azadiyê heta niha peywirên xwe zêde zêde bi cih anîn. Piştî banga 27ê sibatê ya Aştî û Civaka Demokratîk PKKê kongreya xwe ya 12emîn pêk aniye û biryara xwe fesihkirinê da û komeke gerîlayan çekên xwe şewitandin. Hêzên xwe yên çekdar ji Bakur vekişandin û tevî ku ev ji bo tevgereke gerîlayan xeternak e jî, ji Zapê vekişiyan. Li beramberî van gavan dewletê hê ti gaveke şênber neavêtiye. Komîsyona ava bûyî ti bingeheke xwe ya yasayî nîne.

***PKKê piştî kongreyê gelek gav avêtin. Lê dewletê di aliyê hiqûqî û siyasî de gav neavêtin. Çima? Divê gavên çawa bên avêtin?***

Di vê çarçoveyê de, komîsyoneke ji sê partiyan pêk hatî, hevdîtina wê ya bi Serok re bi tena serê xwe têr nake. Ji bo pêvajoyê gaveke dîrokî ye. Berî her tiştî, wateya wê ev e ku Serok Apo ji aliyê dewletê ve bi awayekî fermî weke sermizakerevan hat qebûlkirin. Hem di nav dewletê de hem jî di nav civaka tirk de baronên şer dixwazin barîkateke şer ava bikin, ev hevdîtin dê wê barîkatê biderizîne. Bi xusûsî, helwesta CHPê ya neyînî dê bike ku di serî de kurdên elewî û pê re jî, demokratên tirk û kurd ên CHPê jî helwesta xwe ya li hemberî wê partiyê di ber çavan re derbas bikin. Eger CHP li gorî kodên xwe yên berê yên dewletê tevbigere, ev yek dê hêza CHPê kêm bike. Bi taybetî, civaka kurd dê bersivekê bide vê yekê. Êdî bi vê helwesta xwe CHP dê nikaribe ji kurdan deng bixwaze. Prestîja ku di hilbijartinên herêmî de bi dest xistiye, dê wê jî ji dest bide. Serdana komîsyonekê ya bi Serokatiyê re wekî kaxizekî tûrnûsolê bû. Nîşan da ku Îmamoglû kesayetekî ji Erdoxan jî xeternaktir e. Hevdîtina komîsyonê ya bi Serok Apo re dê bandoreke erênî li pêvajoyê bike. Heger bi tevahî pênebaweriya li ser pêvajoyê raneke jî, qet nebe dê bike ku gel li ser wê bifikire.

***Hûn entegrasyonê çawa pênase dikin? Divê di navbera tirk û kurdan de entegrasyoneke çawa pêk bê?***

Entegrasyon têgiheke yekpare nîne. Bi awayên cuda cuda tên sepandin. Bi awayekî negatîf, pozîtîf dikare pêk bê. Ev peyv bi eslê xwe ji latînî tê û ji wir jî serê pêşîn ketiye fransî û piştre jî li hemû zimanan belav bûye. Entegrasyon tê wateya bihevveyekbûnê. Dewletê çima ev têgih pejirand? Ji ber ku aliyê wê yê negatîf jî heye û ew li gorî xwe li ser aliyê wê yê negatîf disekinin. Entegrasyona negatîf asîmîlasyon e. Li gorî vê jî, civakek hemû taybetmendiyên xwe yên xweser û cuda ji dest dide û di nav civaka din de dihele û dişibe wê. Entegrasyona negatîf her wiha rêbazeke pêkvehelandina li ser bingehekê ye. Ango tê de civaka kurd dê di nav ya tirk de bê helandin û bibe tirk. Jixwe tişta ku heta niha bi destê dewletê hatiye kirin ev bixwe ye. Bi gotineke din, dewlet dixwaze di bin navê entegrasyonê de siyaseta xwe ya înkarkirin û îmhakirinê ya heta îro bi terzeke naziktir berdewam bike. Lê em vê entegrasyonê weke entegrasyoneke pozîtîf esas digirin. Bi gotineke din, dibêjin ku civaka kurd hemû taybetmendiyên xwe yên xweser û rengê xwe biparêze û entegreyê dewletê bibe. Wate, em dibêjin ku li ser zemîna dewlet û demokrasiyê civaka demokratîk entegreyê netew-dewletê bibe. Entegrasyona pozîtîf demokrasiya xwecihî û xwerêvebirinê dihewîne û rê li ber modelên wekî federasyon û konfederasyonê jî vedike.

***Çima pêdivî bi entegrasyona gelan heye?***

Gava pêşîn a entegrasyona demokratîk, entegrasyona hiqûqî ye. Entegrasyona hiqûqî hiqûqeke tevgir û holîstîk e. Ev yek jî makezagonekê û qanûnên bi wê re hevgirtî û lihevkirî ferz dike. Bi gotineke dî, divê hemwelatîbûn ne li ser neteweperestiyê, li ser welatperweriyê bê avakirin. Rixmê vê yekê jî, rezervên / şerxên dewletê yên li ser Şerta Xweseriyê ya Ewropayê divê bi paş ve bê vekişandin.

Entegrasyona demokratîk ew e ku civaka kurd a ku di nav xwe de xwe li gorî demokrasiya radîkal birêxistin kiriye û dewlet û desthilatê veder dike, xwe tevî netewe-dewletê bike. Divê mirov di serî de bibêje ku ev entegrasyon heta hetayê nadome. Entegrasyona demokratîk qadeke têkoşînê ye. Dewlet hewl dide ku civaka demokratîk bi paş ve bibe û civaka demokratîk jî bi rêya xwerêxistinkirinê hewl dide ku dewletê bikişîne ser risteke koordînatoriya kar û baran. Ji ber ku dewlet û demokrasî bi hev re heta hetayê nameşin. Teqez yek yekê bi paş dixe û xwe çalak/serwer dike.

***Têkiliya entegrasyon û siyasetê bi hev re çi ye?***

Gava duyemîn a entegrasyona demokratîk jî, entegrasyona siyasî ye. Ji bo entegrasyona siyasî, civaka demokratîk divê xwe weke rêveberiyên xweser an jî bi awayekî xweser rêxistin bike û xwe entegreyê netewe-dewletê bike. Ev divê ne li gorî rêvebirineke navendî, li ser esasê rêvebirineke xwecihî pêk bê. Ev divê ne tenê civaka kurd, lê berovajî, tevahiya civaka Tirkiyeyê di nav xwe de bihewîne. Di karên ji bilî dîplomasî, parastin (berevanî) û aboriya makro de, divê înîsiyatîfa xwecihî / mehelî serwer be û ev kar divê ji wan re bê hiştin. Karên wekî tenduristî, ekolojî, aborî, perwerde û her wekî wan divê ji cihê cih, bi awayekî xwecihî bên dabînkirin. Şaredarî û walîtî û qeymeqamtî lazim e ku bên yekkirin; li navçeyan qeymeqam û li parêzgehan jî walî divê bi hilbijartinê bên ser kar.

***Hûn dikarin hinekî behsa entegrasyona aborî bikin. Entegrasyona aborî tê çi wateyê?***

Di entegrasyona demokratîk de gava sêyemîn entegrasyona aborî ye. Divê aboriya civaka kurd xweser be. Divê mafê kurdan di asta herî bilind de hebe ku li ser çavkaniyên xwe yên sererdî û binerdî û di vê behsê de gotin, biryar û raye divê di destê kurdan de be. Îro şîrketa ku li Batmanê neftê / petrolê derdixe, baca xwe dide daîreya berhevkirina bacan a Enqereyê. Bi vî rengî, dahata ji çavkaniya li Batmanê ne li gelê Batmanê, lê li aboriya Tirkiyeyê tê zêdekirin. Di heman demê de bi vê polîtîkayê tê xwestin ku nifûsa kurdan koçberî metropolan bibe û li wan metropolan di nava neteweya tirk de bê helandin. Entegrasyona aborî tam jî di vê behsê de yek ji xalên herî girîng e ku dê pêşiyê li vê yekê bigire.

***We behsa entegrasyona civakî kir. Divê em çi ji vê fêm bikin û dê entegrasyona civakî çawa pêk were?***

Di entegrasyona demokratîk de gava çaremîn entegrasyona civakî ye. Di vê entegrasyonê de esas ew e ku ji bo bawerî, ol û hetta mezheban qada xweîfadekirinê û xwerêxistinkirinê bê vekirin; dîsa azadî û wekheviya di navbera zayendan de bên pêkanîn. Dîsa ew e ku temsîla wekhev a mezhebên cuda cuda yên olekê di nav heman rêxistinê de û temsîleke wekhev a olên cuda cuda de, di nav heman rêxistinê de pêk bên. Îro rêxistina diyanetê bi pareke ji bacên gel veqetandî bi tenê xizmeta berjewendiyên mezheba henîfî dike. Bi entegrasyona civakî re, divê hemû ol û mezheb li gorî hêza xwe jê sûdê werbigirin. Bi taybetî jî, azadiya jinan dê bihêle ku hem aştiya civakî pêk bê hem jî kuştina jinan bi dawî bibe. Îro hişmendiya baviksalar a desthilatê, mêrên ku jinan dikujin hema hema bi xelat dike. Di hiqûqa tevgir de li hêlekê dê qanûn bên duristkirin ku wekheviyê di navbera her du zayendan de ava dikin û pê re jî, li hêleke din jî, bi saya perwerdehiyê hişmendiyeke demokratîk bê avakirin; ev jî yek ji amûrên herî girîng ên entegrasyona civakî ye.

***Her wiha we behsa entegrasyona demokratîk kir. Entegrasyona demokratîk çi ye û dê çawa pêk were?***


Entegrasyona demokratîk entegrasyona çandî ye. Her çand xweseriya xwe diparêze, xwe sazûman dike û piştre jî, di entegrasyonê de cihê xwe digire. Bi kartêkirina bimiqabiliyet re çanda neteweya demokratîk teşe digire. Ev çand jî dê bi pirçandî, pirzimanî û pirbaweriyê derkeve holê û ne bi asîmîlasyona bi darê zorê, lê li ser esasê tevlêbûna bidilxwazî dê pêk were. Ziman dê ji hev cuda bin, lê bi demê re nirxên çandî yên hevpar dikarin xurttir bibin. Her du civak jî ev hezar sal in ku bi hev re dijîn û bi piranî jî girêdayî heman sîstema baweriyê bûne; ev jî dê bike ku bi awayekî bileztir pêk bê.

***Têkiliya entegrasyon û xweparastinê bi hev re çi ye?***

Gava herî dawîn a entegqrasyona demokratîk jî xweparastin e. Civaka demokratîk eger xwe bi kûrahî û bi awayê herî berfireh birêxistin bike, zemîna hiqûqî jî dê li gorî vê bê avakirin. Şêweyên din ên xweparastinê û asayîş jî divê di rengê gelê kurd de be û ev jî encameke xwezayî ya entegrasyona demokratîk e.

# Girîngiya wêjeyê di jiyana mirov de

Kûrahiya ramanî, hestyarî û giyanî/derûnî bi wêjeyê dest pê dike. Dema mirov xwe di rêzikên helbestekê yan jî romanekê de dibîne, têgihîştina cîhana xwe ya hundirîn jî pêk tîne



Adar Jiyan



Li seranserê dîroka mirovahiyê, bidestxistina kûrahiya ramanî, hestyarî û giyanî/derûnî bi wêjeyê dest pê dike. Wêje tenê ne wekî qadeke hunerê, ew weke navgîna têgihîştin, derbirîn û veguherîna hebûna takekes a jiyanî, civakî û gerdûnî ye. Wêje, ji do heta îro wekî, weke çavkaniyeke girîng a rexneya civakî hatiye dîtin.

Ji dema ku mirov ji çanda devkî ber bi çanda nivîskî ve bûye, wêje bûye neynika hişê mirov. Lewra hest, raman, sêwirîn û xewn û xeyalên mirovan, bi saya wêjeyê hatine derbirîn. Wêje, ji ber ku têkiliya navbera mirov û cîhanê dişêwîne diyardeyek e ku hem di asta takekesî û hem jî di asta civakî de xwedî girîngiyek bêhempa ye. Ji ber vê yekê erk û vatiniya (peywira) wêjeyê ya li ser asta takekesî û civakî bi roleke pir girîng arbûye.

Mirov ne tenê bi behre û viyana xwe ya aqilmendiyê, bi hest û hizrên xwe jî dibe mirov. Lewra derbirîna hest û ramanê piştgiriyê dide yekparebûna bîr, giyan û bedena mirov. Kesekî/e ku xwe di rêzikên helbestekê de dibîne, yan di hevoka romanekê de rastî şopên êşa xwe tê, an jî di çîrokekê de hesteke cuda hîs dike, her wiha têgihîştina cîhana xwe ya hundirîn jî pêk tîne.

Wêje dike ku takekes hîs bike ku ew ne bi tenê ye. Hestên ku di jiyana wî/ê de hatine tepeserkirin an jî nehatine derbirîn, ji devê karakterekî/ê derdikevin û birînên ku ew nikare di jiyana xwe ya rastîn de bi nav bike, di navbera rêzikên çîrokekê de wateyekê dibîne. Ji ber vê yekê, mirov dikare wêjeyê wekî cureyeke terapiya mirov a hundirîn jî pênase bike. Lewra mirov çiqas bêhtir bixwîne, ewqas kûrtir difikire. Wêje tenê ne cîhana mirov a hestyarî, her wiha pejnkarî û zerengiya mirov a rewşenbîrî jî xurt dike. Lewra wêje têkariyê dide bipêşxistina rewşenbîriya mirov.

Têgihîştin û dahûrandina nivîsekê, girtina motîvasyonên karakteran û şîrovekirina çîrokekê şiyan û hizirîna mirov a dahûranî jî bi pêş dixe. Bi taybetî her berhemek klasîk, bi wateyeke piralî, ji xwîner re pejnkariyeke rewşenbîrî pêşkêş dike. Nivîsên ku pergala ramanê û perspektîfên (bergehên) cuda pêşkêş dikin, viyana mirov a nirxandina cîhanê ji gelekî xurt dikin. Mirov bi rêya wêjeyê, derfetên lêkolînê bi dest dixe da ku ji xwe jî wêdetir rastiyekê bibîne û bi vî rengî xwe ragihîne bêhnfirehiya derûnî. Ev bêhnfirehî hem di jiyana mirov a rojane de û hem jî di pêvajoyên pîşeyî û civakî de xwedî roleke girîng e.

Wêje, hunera avakirina rastiyê ye. Ev jî pêvajoya avakirinê ya ji nû ve ye ku ji bo bal û serinc û xewn û xeyalên mirov çavkaniyeke ramînê ye. Atmosfereke (kawdaneke) berfireh, di hişê xwîner de cîhaneke xeyalî û dîrokî pêk tîne û di bîra mirov de asoyeke nû vedike. Ev tenê bandorê li pêvajoya xwendinê nake, bandorê li têgihîştina mirov a jiyana rojane jî dike.

Wêje, hunera bikaranîna zimên, bi awayekî bedewkar pêk tîne, diedilîne û bi pêş dixe. Her ku mirov dixwîne dewlemendiya zimanê xwe kifş dike; ferhenga xwe berfireh û zerengiya xwe ya derbirînê xurt dike. Tenê ne li ser derbirîna nivîskî, her wiha li ser zimanê devkî jî bandoreke girîng dike. Kesên ku ziman bi awayekî zelaltir, bedewtir û bandortir diaxivin, hem di jiyana kesane û hem jî di jiyana pîşeyî û civakî de jî pêşwendiyek (avantajek) girîng bi dest dixin.


Wêje, zimanê mirov bipêş dixe; hişmediya civakî baştir û derûniya mirov geştir dike. Berhemên nivîskî yên herî giranbuha ku wekî ezmûnên dîrokî, avahiyên çandî, bîrdozî, bawerî, şêwaza jiyanê û nirxên civakê tên dîtin, bi rêya wêjeyî mayinde û nemir dibin. Berhemeke wêjeyî ya nivîskî ne tenê helbest, roman an çîrokên takekesî, her wiha tevahiya bîra kolektîf/hevbeş jî temsîl dike. Destan, çîvanok, çîrokên gelêrî û berhemên wêjeyî yên nûjen kodên rewşenbîrî yên pejnkarî û hestyariyê ku nasnameya kolektîf a neteweyekê pêk tînin, tevahiya civakê ber bi pêşerojeke nû û nûjen ve dikin. Bi vî awayî, wêje dibe yek ji navgîna herî girîng a ku hebûn û mayindebûna neteweyekê misoger dike.

Erka wêjeyê ya ku asta takekes û civakê radigihîne lûtkeya pejnkariyê, hevxemî (empatî) ye. Du hêmanên bingehîn ên wêjeyê hene; yek nivîskar/helbestvan e û ya din jî xwîner e. Her nivîskarek/helbestvan bi rêya roman, helbest û çîroka xwe neheqî, newekhevî, nakokî û pirsgirêkên civakî li ber çavan radixe. Wêje derfetê dide takekes ku serdem û civakê ku tê de dijî pirsiyar bike. Xwîner di cîhana nû de şîn, şahî, êş, kêfxweşî, reşbînî, xweşbînî, pêşwendî û paşwendiyên cîhan û jiyanê di şexsê xwe de dibîne; li ser difikire û dinirxîne. Ev yek ji bo xwîner ezmûneke girîng e û ev ezmûn hest, raman û hişmendiya mirov dikemilîne, hestyarî û pejnkariya wî/ê bi pêş dixe. Lewra têgihîştin û rêzgirtina ji bo çand, ezmûn û nasnameyên cuda bi rêya wêjeyê bi dest dikevin. Wêje ji bo ahenga civakî û çanda hevpar a jiyanê derfeteke girîng e. Wêje deriyekî cîhanê yê nû li ber mirov (xwîner) vedike. Mînak, bi derketina romana nûjen re, rewşa takekes a civakî pevçûna çînî, pirsgirêkên azadiyê, saziyên siyasî û tevgerên exlaqî dest pê dikin ku bi tevayî tên nîqaşkirin. Guherîn û veguherînên civakî, bi deriyên rexneyî yên ku ji hêla wêjeyê ve vedibin, dest pê dike

Wêje, avakirina nasnameya neteweyî û gerdûnî ye. Wêjeya her civakê xwedî nasnameyeke bêhempa ye. Her berhemeke girîng a wêjeyî her wiha gerdûnî ye jî. Ev realîte bingeha hêza wêjeyê ye ku hemû civakên cîhanê bi hev ve girê dide. Her çendî ku her civak bi rêya wêjeyê nasnameya xwe ya neteweyî bi dest dixe, hest û ezmûnên hevpar ên mirovahiyê jî parve dike. Mînak, Mem û Zîna Ehmedê Xanî hîmê çand, ziman û wêjeya kurdî ye. Destana Homer, nirxekî bingehîn ê çanda yewnanî ye û beşek ji vegotina mîtolojîk a hevpar a mirovahiyê ye. Hamleta Shakespeare, dawera wêjeya îngilîzî ye. Van kesyaetiyên hêja bi berhemên xwe, jiyana gelê xwe bi tevahiya cîhanê dane nasîn. Ji ber vê yekê, wêje hevgirêdana nasnameya neteweyî û hişmendiya hevpar a gerdûnî bixwe ye.

Têgihên bingehîn ên wekî jiyan, mirin, evîn, tenêtî, azadî, dadmendî û hwd mijarên herî zêde ne ku di wêjeyê de tên dahûrandin. Tevî cihêrengiya cîhanê, hemû mirov hest, hizir û bûçûnên xwe (hêvî, fikar, şer, şîn, bêhêvîtî, evîn, xem, xewn û xeyalên xwe) bi rêya wêjeyê parve dikin. Li ku derê hatibe nivîsandin jî, berhemeke wêjeyî ya baş, giyanê hemû mirovan digihîne hev. Di vê çarçoveyê de, wêje zimanekî gerdûnî ye ku netewe, çand û ziman jî derbas dike û bîra kolektîf û ruhê hevpar ê mirovahiyê pêk tîne.

Wêje ne tenê cîhanê vedibêje; ew wateyê jî dide jiyanê da ku mirov bi armanca hebûn û xwebûna xwe bihese. Mirov bi rêya wêjeyê hem di nav lêpirsîna hebûna xwe û hem di nav têkiliyên mirovahiyê yên gerdûnî de ye. Ji ber vê yekê, wêje hem neynika hebûnê û hem jî hîmê avakirina zimanê hevpar ê mirovahiyê ye.



Delav
Feratê Dengizî

# Dilo Ez Bimrim...

Ma mirin hezkirin e! Em ê zanibin bimirin jî lê divê jiyan li pêş be, evîn, hezkirin û azadî li pêş be!

"Dilo ez bimrim dilo hewar..."

Destan, çîrok, helbest û klamên me yên li ser hezkirin û evînê tev bi mirinê tên şîrovekirin û xweşkirin. Gelo çima ?

Destanên me; Xecê û Siyabend, Memê Alan, Mem û Zîn, Zembîlfiroş, Ferhat û Şîrîn... hwd. tev bi mirinê hatine sêwirandin û qedandin. Ev çi qeder e? Ev çi evîn e? Ev çawa hezkirin e?

Ku difikirim serê min diêşe. Ma hezkirin îlem divê bi mirinê bê ezmûnkirin, bi mirinê bê qedandin? Hezkirina li ser rûyê erdê ya jiyanê ji me re heram e!

Bala xwe bidin çanda me ya heyî, ya ku me dîtiye û berî wê; îlem hezkirin ango evîn bi mirinê tê qiyaskirin; "ez ji bo te dimirim, ez ê ji bo te bimirim, heta mirinê ez a/ê te me..."

Hevokên herî li pêş ên jiyanî ne. Çima "ez ê ji bo te bijîm, te û xwe azad bikim, li warekî azad em bi hev re bijîn.." dernakeve pêş, helbet hişmendiya ku van salên dawîn derketiye pêş ne tê de... hezkirin, evîn û mirin her para hev in.

Ne bi tenê li warê me Kurdistanê, li Rojhilata Navîn jî ev hişmendî li pêş e.

Nexwe şert û mercên hezkirin û evînê li ser vê xakê, li vî welatî nîn in.

Me herimandiye ev hest û hebûna herî bingehîn. Divê em ji bawerî heta mîtolojî û nirxandina jiyanê xwe di ber çavan re derbas bikin, xwe bilerizînin, xwe ji nû ve bi baweriya hezkirin û jiyanê bişon û xwe nû bikin!

Li vir derew û xapandinek heye!

Çima xwegihandina hev li dinyayeke din, li dinya din, ne li vir!

Çima em dihêlin bihuştê, ma jiyan û warê me ne bihuşt e, ne cinet e.

Hilbet herimandina war û jiyanê sedem e ku sedema vê ya bingeîn jî serdestî û desthilatdarî ye ku li ser bingeha derew, xapandin, kedxwarî û xwînmijiyê hatiye avakirin.

Divê ji vê hêla girîng jî em aştî û demokrasiya jiyan, malbat, habûn, civak û pergaliyê jî bibînin, bifikirin û têkevin nav hewldan û xebatê.

Em jiyanê; ango hezkirin û evînê dixwazin, wekhevî û azadiyê dixwazin; ne mirinê!

Ev hezkirin û mirin ji bo evîna welat û war jî wisa ye; em zû dimirin, ji bo welat mirinê dixwazin. Lê divê ji bo welat jiyînê, jînbûnê û avakirina azadiyê jî bifikirin. Em ê bijîn ku li ber xwe bidin, têbikoşin ku azadiyê bînin û bingeha hezkirin û evînê di civaka xwe de ava bikin.

Êdî dema çêkirin û avakirina jiyana azad e.

Bêheq feylesofê hemdem negotiyê;
**"heqîqet evîn e, evîn jî jiyana azad..."**

Helbet em ji mirinê jî narevin di vê têkoşînê de, lê tekoşîna hebûn, jiyan, azadî û evînê jî ji bîr nekin û wisa bibin lehengê jiyanê.

Yanî dixwazim bibêjim, divê em ji qedera reş xwe bi dûr bixin û şert û mercên jiyanê li gorî evîn û azadiya xwe bikaribin nû bikin. Îrade, hez, hêz û rêxistina me bikarbûna/bikêrbûna me heye.

Em ji derûniya bindestiyê xwe xilas bikin û jiyana ne li gorî dilê me wek qeder nebînin. Bi xwe bawer bin û bizanibin ku em ji jiyanê çi dixwazin û bi kêrî çi tên! Em xwedî biryar û bîrdozî ne êdî û em dikarin xwebûna bi cih bînin. Em bi xwe bawer in û xwe biçûk nebînin.

Na, jiyana me ne mecbur e ku reş be, ronahiya me heye, ji çanda me ya kevn û di serdema nû de ev jî heye, rehên me yên ronahiyê û niha jî şaxên jiyana me bi ronahî ne.

Em ji bo evîna xwe nemirin, bijîn û pêk bînin. Jiyan xweş e û jiyan bi evînê xweş e.

Bila ev hestbest, helbest diyarî evîndarên hişxurt be!

**Gerînek hişyariyê**
*Li Girêka Aram Tîgran*
*Sipartiye gopalê xwe*
*Berê'm li dahatûyê*
*Ka ronahî li ku ma*
*Ka ronahî li ku ma*
*Li ku ma, li ku ma...*

*Dixwazim şêwe û*
*Awaza Elîkê Zorê*
*Evîn, herê ew evîn*
*Heye di her sûretî de*
*Encam ma ji çavên dil*
*Çi bersiv, çi fêhm*
*Li hêviya ronahiyê*
*Li ku ma, li ku ma...*

*Her kes ava dike*
*Dinyayekê ji xwe re*
*Lê kortika pistê xwe dixwirîne*
*Ew bejnên takrihanî çûn*
*Canê tev goştê gir î genî hatin*
*Ev berhemên talan û zordestiyê*
*Ma zimanê te kuliyan xwariye!*
*Bêje, bibêje*
*Ka li ku ma*
*ronahî*
*Li ku ma, li ku!*

*Evîn û derdên min*
*Man li qibalê*
*Ser nexşeya gul û Şaha Maran*
*Herê lo, jinê bidin jinmiryan*
*Kerê bidin kermiryan*
*Ev mejiyê kurmaxwarî*

*Fereca xêrê ne dûr e!*

*Çav qurimîn,*
*Mîxkî li felekê xin,*
*Bes e bendewarî*
*Li ku ma li ku..!*

*Hûn bibin ronahî*

***Em ê zanibin bimirin jî lê divê jiyan li pêş be, evîn, hezkirin û azadî li pêş be!***
***"Dilo ez bimrim dilo heyran...***

# Helwesta li dijî çareseriya doza kurdî

## CHPê, wek partiyek ku îdia dike sosyal-demokrat e û di nav partiyên mixalefetê de xwedî bandoreke girîng e, bi redkirina çûyîna Îmraliyê gaveke ku ji bingeha xwe ya îdeolojîk dûr dikeve avêt û zerarê dide pêvajoyê



Xweşkanî
Felemez Ulug

Komîsyona Demokrasî, Xwişk-Biratî û Hevgirtina Millî bi rojeva çûyîna girava Îmraliyê 21 mijdarê li hev civiya. CHP civîn terikand û çûyîn red kir. Di dîroka nêz a siyaseta Tirkiyeyê û Kurdistanê de wekî werçerxeke girîng tê dîtin. Ev biryara CHPê ne tenê reaksiyonên siyasî yên demkî ne. Di heman demê de vegotina nêzîkatiya bingehîn a partiyê li hemberî "Doza Kurdî" û têgihîştina wê ya "demokrasiyê" ye.

Tevî redkirina CHPê jî roja 24ê mijdara 2025an, Komîsyona Demokrasî, Xwişk-Biratî û Hevgirtina Millî li girava Îmraliyê û hevdîtineke dîrokî bi Rêber Abdullah Ocalan re pêk anî. Ev hevdîtin, di çarçoveya pêvajoya aştî û civaka demokratîk de, di dîroka nêzîk a komara Tirkiyeyê û Kurdistanê de weke qonaxeke girîng tê dîtin. Heyeta komîsyonê, ku ji endamên AKPê, MHPê û DEM Partiyê pêk dihat, li ser esasê biryara piraniya dengên komîsyonê çû Îmraliyê.

CHPê, wek partiyek ku îdia dike sosyal-demokrat e û di nav partiyên mixalefetê de xwedî bandoreke girîng e, bi redkirina çûyîna Îmraliyê gaveke ku ji bingeha xwe ya îdeolojîk dûr dikeve avêt.

CHP bi awayekî kevneşopî di navbera bingehên xwe yên laîk, komarparêz, elewî û xeta siyaseta neteweperest de di nav nakokiyekê de ye. Di dema zêdebûna hestên neteweperest ên li Tirkiyê de, redkirina hevdîtina bi Rêber Abdullah Ocalan re bi aramanca ji aliyê rastgirên tirk ve neyê rexnekirin û dengdêrên neteweperest ên mixalefetê wenda neke pêk hatiye. Bi gotineke din, CHP ji bo ku "bila neyê gotin ev bi PKKê re hevkariyê dike" gaveke siyaseta parastinê avêtiye.




CHP di nêzîkatiya xwe ya li dijî doza kurdî de, di navbera "ewlehîperestî" û "demokratîkbûnê" de maye. Redkirina çûyîna Îmraliyê, hişt ku mijara doza kurdî careke din di çarçoveya ewlekarîperestiyê were nirxandin ku ev yek jî di vê pêvajoyê de bi serê xwe kêmasiyek ciddî ye. CHP di dîroka xwe de, di dema rakirina parêzbendiyên parlementeran de û di helwestên din ên girîng ên têkildarî kurdan de jî, bi awayekî domdar li pişt hêzên neteweperest ên tirk cih girt. Redkirina çûyîna Îmraliyê nîşan dide ku rêveberiya CHP ya nû jî mînak ji rexneyên berê negirtiye û zirar dide nasnameya xwe ya ku weke sosyal demokrat tê binavkirin.

CHP beriya niha raporek 7 xalî ji bo komîsyonê amade kiribû ku nîşan dide ku ew naxwaze bi temamî ji rojevê dûr bikeve, lê dixwaze rewşê bi daxwazên siyasî yên li gorî berjewndiyên wê werin rojevê. Lê em dikarin bêjin ku ev ji raporê wêdetir ji bo di vê qadê de xwe bide naskirin, ev hewldan bi pêş xistiye. Lewma di vê mijarê de gotin û pratîka wê qet li hev nayên.

Biryara çûyîna Îmraliyê ya bi piştgiriya AKP, MHP'ê û DEM Partiyê, nîşan dide ku ev gav ji bo "aştî û çareseriyê" gaveke girîng e, ku hem ji aliyê rastgirên tirk ên nerm, hem jî ji aliyê siyaseta kurdî ve tê piştgirîkirin. Terikandina CHP'ê ya civîna komîsyonê, dibe sedem ku CHP di vê pêvajoya dîrokî de wek aktoreke bingehîn a siyaseta Tirkiyeyê rola xwe ya çareserîkar wenda bike.

Doza kurdî bi awayekî berfireh wek doza demokratîkbûna Tirkiyeyê em dikarin bi nav bikin. Partiya ku xwe wekî pêşenga demokrasiya laîk dihesibîne, bi dûrketina ji vê pêvajoya çareseriyê, derî li ber xurtkirina feraseta ewlekarîperestiyê vedike. Ewlehîperestî rê li ber sînordarkirina maf û azadiyan vedike, û bi vî rengî, nasnameya CHP'ê ya ku divê bibe hêza sosyal demokrat, ji aliyê siyasî ve lawaz dike.

Li gorî nêrîna zanistî ya siyasî, gelek derdor dibêjin CHP ji bo dengdêran wenda neke ev biryar daye. Lê di bingeha xwe de rastî ne ev e. Partiyek weke CHP divê li gorî hesabên wisa biçûk û teng tev negere. Bi gotinek din qada siyasî vala nehêle ku li ser mijarê gotina xwe bike. Gelek derdor li ser vê biryara CHPê hemfikir in ku wê şaşitiyeke dîrokî kiriye.

CHP îro yek ji wan partiyan e ku herî zêde bahsa demokrasî û mafên bingehîn dike. Lê li ser mijareke ku bi salan e didome, li gorî berpirsyarên xwe yên dîrokî çima tev nagere. Li gorî nêrîna min mirov tenê vê weke nêzîkatiyeke siyasî binirxîne wê kêm bimîne. Bi gotineke din, ev biryara ku hatiye dayîn nêrîna rêveberiya CHPê aşkere dike ku çawa li pirsgirêkên bingehîn ên Tirkiyeyê dinêre.

Gelek derdor vê helwesta CHPê weke 'xweparastina siyasî' şîrove dikin. Li gorî nêrîna min, ev nêrîneke pir teng û ji analîzên siyasî dûr e. Ti eleqeya vê helwestê bi zextên îro li ser tên ferzkirin jî nîne. Divê em bizanibin ku pêkhateyên siyasî di rewşên zehmet de eniya xwe xurt û berfireh dikin da ku bikaribin gelek derdorên cuda jî bikşînin aliyên xwe. Lê CHP bi vê hemleya xwe em dikarin bêjin bi tenê ma. Di rewşeke wisa bi tenê mayî de wê çawa bikaribe di vê qonaxa dîrokî de bi erk û berpirsyar tev bigere nayê zanîn. Tişta diyar dibe ewe ku CHP ev pêvajo baş nexwed û di şîrovekirina mijarê de lewaz ma.

Ji aliyê din ve, biryara CHPê ya redkirina çûyîna Îmraliyê, bi awayekî aşkere nîşan dide ku partî hêj di nav çarçoveya îdeolojiya komara yek-netewe û yekziman a damezirîner de asê maye. Ew tirs dikeve navbera xeta neteweperest û xeta demokratîk a partiyê û her carê li ser hesabê demokrasiya kurdî, ber bi xeta neteweperest ve diçe.

CHP bi vê helwesta xwe ne tenê zirarê dide pêvajoya çareseriyê, di heman demê de nasnameya xwe ya sosyal demokrat jî lawaz dike û xwe ji rola aktora sereke di demokratîkbûna Tirkiyeyê de dûr dixe. Ji bo ku CHP di siyaseta Tirkiyeyê de roleke pêşverû bilîze, divê ji tirsa hêzên nijadperest dûr bikeve û bi cesaret li doza kurdî xweyîtiyê bike da ku di çarçoveya pêvajoya aştiyê û çareseriya siyasî de were çareserkirin.

Heke CHP di vê pêvajoya dîrokî de li pişt diryara xwe bisekine û ji bo bipêşxistina pêvajoyê gavên pêwîst navêje, wê gelên Tirkiyeyê û dîroka demokrasiyê wê weke partiya ji demokrasiyê direve pênase bike û tomar bike. Biryara komîsyonê ya çûyîna Îmraliyê, bi piraniya dengan, nîşan dide ku her çend CHP ne amade be jî, vîna çareseriyê di nav meclisê de xurt e û pêvajo wê berdewam bike.

Bêguman ne tenê CHP, paratiyên din ên ku çûyîna Îmraliyê red kiriye jî, wê di vê qonaxa dîrokî de bi rûreşiya xwe werin naskirin. Xweyîtiya li pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ne tenê erk û berpirsyariya hêzên demokrasiyê, erka hemû derdorên siyasî ye ku piştgiriyê didin demokratîkbûna Tirkiyeyê. Lewma lazim e ku di vê pêvajoya girîng de hemû derdorên siyasî û civakî li gorî ruhê demê berpirsyarî bigirin ser xwe û li gorî wê beşdar bibin. Serketina bi hêza kolektîf wê bi xwe re hêza demokrasiyê jî xurtir bike. Ev ne tenê ji bo kurdan, ji bo hemû pêkhatiyên li Tirkiyeyê yek ji mijarên herî girîng e.

Xeyrî Welat Serhed

# Komareke demokratîk an 'Serkeftina Pîrûsê'!

Komara Tirkiyeyê ya ku hîmê wê yê bingehîn li ser navê tirkperestiyê hat avakirin, li înkara gelê kurd re sed sal in ku tê birêvebirin. Bi sedan komkujî, talan, tecawiz, dagirkirina ax û erdnîgariya Kurdistanê re, êş û elemên bêsînor bi gelê kurd da kişandin. Êş û elemên gelê kurd, bi înkar û îmhayê hêj berdewam dikin. Dewleta tirk îro jî dixwaze vê polîtîkaya xwe bidomîne. Hêviya wê ev e. Lê berxwedana gelê kurd vê xweziya wê di qirika wê de dihêle. Têkoşîna azadiyê ya 52 salên dawî, ne tenê ispata vê yekê, hêvî, vîn û biryardariya wê ye jî.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, di gelek nirxandinên xwe de li ser "Komara Tirk" disekine û komara ku di pêşengiya Mustafa Kemal de hat avakirin, ji gelek aliyan ve dinirxîne. Aliyên komarê yên ku mafên kurdan destpêkê diparêze û piştre bi komkujiyan berdewam dike, bi berfirehî şîrove dike. Di serî de kurd û gelek gelên wekî ermen, laz, çerkez, suryan û hwd. ti xêrê ji vê komara înkarê nedîtin.

Polîtîkaya înkarê ya ku bi dehan sal in berdewam e, ti tişt bi gelan neda qezenckirin, gelek nirxên hevpar da wendakirin. Têkoşîna gelê kurd a bi pêşengtiya Rêber Ocalan 52 sal in tê meşandin, bi ked û sebreke mezin, dixwaze bi dewleta tirk bide fêmkirin ku komara înkarê ti tiştekî bi gelan nade qezenckirin. Li dijî vê komara înkarê, teza Rêber Ocalan a bingehîn jî 'Komara Demokratîk' e. Bi komareke demokratîk pêşerojeke aram û ronî dikare ji gelan re jiyaneke xweş bîne.

**Divê bêjin ku 'kurd ne bi dûvik in'**

Mustafa Kemal ji kavilên dewleta Osmanî senteza komarê derxist, teza Rêber Ocalan 'Komara Demokratîk' e. Li ser hîmê Komara Demokratîk ne tenê yekîtiya gelên kurd û tirk, yekîtiya hemû gelên li Tirkiyeyê dijîn û dîsa yekîtiya gelên li Rojhilata Navîn dikare bê avakirin. Di warê ol, bawerî û mezheban de jî ev bingeha yekîtî û hevduqebulkirinê heye. Lê divê dewleta tirk berî her tiştî dest ji polîtîkaya înkarkirinê berde. Gotinên "hemwelatiyên Tirkiyeyê, birayên me yên kurd'' û hwd êdî gelan têr nake, zarok jî bi van gotinan naxapin. Wê demê divê çi bê kirin ku gel û mirovahî bi dilrehetî piştgiriyê bidinê? Berî her tiştî divê di makeqanûnê de mafên kurdan ên bingehîn bên qebûlkirin. Fermiyeta van tiştan divê hebe. Divê bi rastî bêjin ku 'kurd ne bidûvik in', mirov in, xwedî mafên mirovî ne û ev mafên mirovî yên ku bi sedan salan ji destê wan hatine xepiskirin, bên dayîn. Ji derveyê van, zikê kurdan ji vir û derewan gelekî têr bûye.

**Karê Ocalan parastina nirxên gelan e**

Berî her tiştî divê bê zanîn ku wekî berê bi polîtîkaya înkarê ti tişt dê bi silametî nameşe û ev rêbaza înkarê dê tiştekî bi gelên Tirkiye û Kurdistanê nede qezenckirin. Bi salan e ku dewleta tirk bi çavkorî şerekî dide meşandin. Komarê bi polîtîkaya înkarê bi rê ve dibin. Vê polîtîkayê jî bi xwe re wêranî û karesat anî. Li dijî vê polîtîkaya înkarê, kurd û Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan çi dibêje û kîjan rêyê didin ber gelan? Hevparî, xwişk û biratiya gelan nîşan didin. Komareke demokratîk, entegrasyoneke demokratîk nîşan didin. Li ser hîmê neteweke demokratîk, mafên hemû mirovan ên exlaqî û polîtîk bên parastin pêşniyar dikin. Ji bo vê 52 sal in ku Rêber Ocalan ked dide û dixwaze gelên li vê erdnîgariyê bi awayekî aştîxwaz bigihîne pêşerojeke azad.

**Heke lihevhatina gelan çênebe**

Niha li hemberî dewleta tirk rêyeke maqûl û bi parêzvaniya nirxên hemû mirovahiyê hatiye destnîşankirin heye. Rêber Ocalan jî, Tevgera Azadiyê ya ku bi rêbertiya xwe ve girêdayî jî û gelên aştîxwaz jî bi her awayî dixwazin piştgiriya vê rêya wekheviyê bikin. Di her warî de ji bo vê dixebitin, kedê didin û gavên dîrokî diavêjin. Sebreke mezin didin nîşandan, rîsk û xetereyên mezin digirin ser xwe. Ne ku bêhêz û lewaz in vê dikin, berovajiyê wê, ji hemû demê bihêztir in û gavên bi wêrekî diavêjin. Ya ku ji siya xwe ditirse, dest ji niheqiyê bernade, di polîtîkaya qirkirinê de israr dike, dewleta tirk û rantxurên wê bixwe ne.

Em hêvî dikin ku dest ji vê hişmendiya xwe ya gemar berdin. Di komareke demokratîk de bijîn ku dest ji înkar û tunekirina gelê kurd berdaye. Em hevî dikin ku bi awayekî demokratîk û wekhev bi hevdu re bijîn. Heke ev pêk neyê dê çi be? Wekî ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan gotiye; "Dê şerekî bi qasî deh Gazzeyan rû bide.'' Ev ne gef xwarin e, pêşdîtinên ku me ji dîrokê derxistine. Di serî de Îsraîl, hemû hêzên şerxwaz vê yekê dixwazin. Dixwazin şerê kurd û tirkan berdewam bike. Ev dê bi ti kesî nede qezenckirin, dê ev bibe "Serkeftina Pîrûsê."



# Dîroka nû, aqilê zarokên kurdan

Zarokên kurd, nifşên nû yên gelê kurd, li hemberî keleha zilmê, êdî bêdeng namînin. Bêguman 'aqil'ên ku li Tirkiyeyê rastiyan dibînin hene û dizanin ku banga Rêber Abdullah Ocalan ya aştî û çareseriyê, fersendek dîrokî ye



Medenî Ferho



Tevgera Azadiya Kurdî-PKKê dirokek nivîsî. Zarokên kurd wê bi vê dîrokê mezin bibin. Rêber û destûrname ye; eger dîtinek nû, hişmendiyeke nû nebe, pêşketin çênabe. Huner jî çênabe. Bi avakirina dewleta tirk re, çavkanî û avzêmkên hişmendiya kurd hatin zuhakirin. Wehşet hebû. Ji wehşetê jî hişmendî û hewngîrî dernakeve. Berhema wehşetê her dem bûye şaristaniya kor û seqet. Vêca, sitûna bingehîn a Dewlet-î Alî Osmanî 'yençerî' bûn. Ew jî koma pençîkên Balkanan bûn û ji pirtûk, alim û ulemeyan dûr hatibûn perwerdekirin. Berhemdariya wan kuştin, talan û wêrankirin bû!

Bi avakirina dewleta tirk re, 'ayet û layihe'yên kemalîstan dest pê kir; yek, marşa ku her sibeh bi zarokên dibistanê didan xwendin; du, nutuk-xîtabeta bi ciwanan didan ezberkirin. Ev ne dîrok e, ne jî dikeve sîstema perwerdehiyê. Kuştina zihniyeta kollektîf e û paşverûtî ye. Prof. Dr. Ismet Şerîf Wanli dibêje; "Vê zihniyeta paşverû dîroka kurdî, çand, tore û nirxên kurdan berteref kirin, taybetmendiyên kurdîtiyê mandela-înkar kirin..." Ev mandelekirin bû sedema ku têkiliya kurd, bi erdnîgarî û gelên din re were qutkirin.

Auguste Comte jî li ser mijara 'dîroka civakî' dibêje; "Eger li dîrokekê, navê gelan, navê serkêş û lîderan derbas nabe, ew dîrok, ji aliyê sosyolîk û felsefî ve temam nebûye..." Her çiqasî dîrokzan Ayşe Hur bibêje, 'netewe-dewlet, polîsî' ne, dewleta tirk cuda ye. Dewleteke leşkerî ye û ev leşkerî jî, li ser bingeha 'çeteyên Îttîhat û Terakkî'yê hatiye avakirin. Serokkomarê Tirkiyeyê Erdogan jî, her dem gotinên 'Nizam-î alem û beka dewletê' bi kar tîne û otorîteya 'yenîşerî'yan tîne ziman. Mînak, sala 1930î, generalê Nazî Moltke, bi rêya îstîxbarat û çekdarî, li Tirkiyeyê bingeha dewleta 'ezelebed' û 'yekperest' ava kir.

Pirs 1: Gelo kîjan paşayên Îttîhat û Terakkî weke cellad nehatiye binavkirin? Pirs 2: Gelo kîjan generalê artêşa tirk di nav sed salî de nebûye celladê kurdan?

Di encama vê polîtîqeya 'saqit û seqet' de dewleta tirk, ber bi tofanekê ve çû. Ne felsefeya civakî, ne felsefeya dîrokî esas girt. Vê jî rê li ber 'ademiyeta dewletê' girt! Di destpêkê de 'laîktî'ya yekperest a 'spî' pejirandin; piştre di teolojiyek yekperest a kesk û 'vecd'ê de israr kirin. Her du sîstem jî faşîzm in, ji bo paşerojan ji tî zanist, felsefe û dîrokê feyz nagirin. Bi gotina Abdulah Ocalan, 'Vê sîstemê ji bilî izdiraba gelan tiştekî din neanî (...) gelên Anatolyayê helandin û qurpandin..." (...) Li ser encama derketiye holê jî dibêje; "Kurdîtî, çîroka mirovahiyê ye..." [1]

Ev gotin tên wateya 'anatomiya kaosên sedsalî' û zêdekirina 'kaosên trajîk', eger zanist, felseya civakê, felsefeya dîrokê nebe, jiyan gelekî zor dibe. Balkêş e, herî zêde kesên xwedî titra 'prof'tiya ku ji zanista kevin û nû bêpar mane û kesên xwe weke 'pisporên teror û şer' didin naskirin, li dijî 'pêvêjoya aştî û civaka demokratîk' derdikevin. Bi taybetî êrişî Abdullah Ocalan dikin. Sedem jî, aqilê wî, fikir û hişmendiya wî, tez û antîtezên wî, paradigmeya wî ya hemdemî ne. Gotina wan a pêşî û paşî 'nabe ku dewlet bibe muxatabê, rêxistina terorê û serokê wê rêxisina terorê...'

Ev gotin hegemonya dîroka fermî ye. Di çaryana bixwîn de wendakirina rêya rast e; dîroka fermî goristana înkarê ye. Çaryana bixwîn jî, rêyên diçine goristanan e!

Balkêş e û rastiya tê jibîrkirin; hêza ku xakên dewletên cîran dagir kirine û dika artêşa dewleta tirk ye; hêza ku li dijî gelan serî li rêyên terorê dide, gundan wêran dike, mirovan di malan de dişewitîne, mirovan di çalên asîdê de tune dike, ji helîkopteran diavêje, mirovan ji malên wan direvîne û dikuje, komen paramilîter ava dike ew in. Pirs jî ev e; gelo teror çi ye, rengê terorê çawa ye?

Me li jor hinek mînak dan; hişmendî-tefekkur, wêje-helbest tirsa herî mezin a desthilatdariyên pêşî û paşî ya dewleta tirk e. Sal 1923an, bi Qanûna Takrîrî Sukûn dîktatoriya Îttîhat û Terakkî hat saxlemkirin; îro jî, bi Qanûna Muhakemat û Qanûna Înfazê, kiryarên tecrîd û tayînkirina qeyûm, dîktatoriya wan hatiye saxlemkirin.

Em ê gotina navê Xwedê Ya Huu bi kar bînin û bêjin: Aktorê dîrokê aqilê mirov e... Ev aqilê ku îro weke aktorê dîrokê derketiye holê Abdullah Ocalan e... Dewleta kûr, yan jî nekûr, ev rastî fêhm kir, dît ku dewlet nema dikare kaosan ragire û ber bi tofanekê ve diçe, banga dexaletê kir. Abdullah Ocalan jî bersiva bangê da. Bi banga aştî û civaka demokratîk, xwest ku dewletê ji 'mekanîka faşîzmê' rizgar bike. Tez û antîteza rizgariya ji kaosan û têkçûna tofanî danî holê û got; rêya çarseriyê rêbazên gerdûnî ne, divê bendên li pêşiya demokrasî rabin, divê mihraba red û înkarê, teolojiya mandele û tunekirinê were terkkirin. Tefsîra Misilmantiyê di peymana Medînê de; jiyana hevpar û biratiyê di dîroka hezar salî, di hevkariya kurdan û selçukiyan de veşartî ye.

Got; azadî û edaleta civakî di wijdanê şiyar de ye...

Lê aqilê seqet û saqit; Abdullah Ocalan jî di nav de, hemû siyasetmedarên kurd, bi sucdariya Drayfus girtine, digirin û di zindanan de îzole kirine û bi terorê sucdar dikin. Ev aqil wê nikaribe gelan ji kaos û tofanên mezin rizgar bike.

Siyaset hunera şivantî, parastin, aramî û aştiyê ye; lê di pêvejoya 'aştî û çareseriya demokratîk' de, hêzên siyasî, yanî partiyên siyasî li Tirkiyeyê parçe bûne. Zanist, ronahiya li pêşiya civakan, perwerdekirin û têgihîştina civakan e, parastina jiyaneke ademî, demokrasî û tekûzkirina jiyeneke bi exlaq e. Li Tirkiyeyê, bi gotina antropologê amerîkî, Clîfford Geertze; muneccim, alim û muderris, yanî mamosteyên zanîngehên li Tirkiyeyê, hîna "pevçûna dîk"an dikin.

Min di hevoka destpêkê de got; zarokên kurd, nifşên nû yên gelê kurd, li hemberî keleha zilmê, êdî bêdeng namînin. Bêguman 'aqil'ên ku li Tirkiyeyê rastiyan dibînin hene û dizanin ku banga Rêber Abdullah Ocalan ya aştî û çareseriyê, fersendek dîrokî ye. Çûna şandeya komîsyona çareseriyê ya Îmraliyê jî, wê bibe find û fanosa ronîkirin û bidestxistina derfet û rêyên nû. Ji xwe Rêber Apo, barê giran daniye ser milê gelê kurd û dînamîkên demokratîk ku ji bo pêvejo bi ser bikeve têkoşînê xurt bikin.

Dîsa bi navê Xwedê Ya Huuu; jiyan bê tekoşîn nabe û têkoşîna ji bo jiyanê jî şertê nebe nabe ye. Kesên li dijî jiyana mirovan, ji dijî mafê civakan derbikevin, ji hemû nirxên mirovî dûr in û bi gotina jinebiyan 'tuqaqa' ne. Çand, aqil e û her însanî ye, exlaqî ye. Eger dewlet û hiqûqa wê dewletê, li dijî çand û exlaqê civakê be, zimanê civakan, tore û wêjeya civakan înkar û red bike, bi gotina sosyologan 'barbar e', ji 'nirxên gerdûnî' dûr e; ne di aliyê 'ademî navendî' de, ne di aliyê 'nenavendî' de nayê qebûlkirin; bi modeleke xurafeyî, xeşîm, bêaqil, newî haydûd û çete tê qebûlkirin.

Li aliyê din, kesên ku zilm û zorê, înkar û tunekirina sed salî ya li dijî gelê kurd ji nedîtî ve tên, nikarin rastiya gelê kurd fêhm bikin; nikarin rastiya Abdullah Ocalan, fikir û ramanên wî yên modern fêhm bikin; nikarin rêxistinî, hûnandin û felsefeya Tevgera Azadiya Kurdî bibînin û nas bikin. Cîhan ji nû ve nayê keşifkirin, efkâr-î umumiye jî ne kor e. Lê ew kes, sefaleta bazirganiya rantê dijîn. Bi gotina mutefekkûr-feylesofê Kurd Saîd-î Nursî, 'Suret-î me'nûs û sîretî ma'qus' in.

Tevî ku hemû daxuyanî û nirxandinên Abdullah Ocalan, daxwaza lihevkirinê, pêkanîna aştiyê, bidawîkirina şer e, daxwaza demokrasî û mafên demokratîk in, rêvekirina li pêşiya siyaseta demokratîk û pêkanîna demokrasiya rasteqîn e; dewşirme xwe ji bedcaniya 'du-ruhî' rizgar nakin. Bedcaniya 'du-ruhî', tenê di kesayeta naziyan de heye. Kesên asîmile dibin, yanî ne 'dew in û ne şîr in' dewşirme ne, bê exlaq dibin, ji derve ve paqij xuya dibin, lê nava wan tejî pîsî ye!

Kurdan bi pêşengiya Abdullah Ocalan, engizîsyona sedsalî şikand, weke civakeke siyasî û ferdên siyasî meydanan dadigirin; di parlamentoya Enqereyê de, ji bo avakirina dewleteke modern, hemdem û demokratîk, ji bo 'rêya sêyemîn' têdikoşin.

Guman tê de nîne, esseh û teqez e, şandeya komîsyona ku ji bo çareseriyê hatiye avakirin, wê bi hevdîtina bi Abdullah Ocalan re, bibe xwedî fikreke cuda û ji dilê 'wêranzarî'yê rizgar bibe.

Abdullah Ocalan, aqil e, xeşîmên jiyana rojane ronî dike; santralîzmê red dike, kollektîvîzma demokratîk pêşniyaz dike; bê çawa di realîteya civakî de gelê kurd ji tunebûnê rizgar kir û gihand radeya tekamulê, wê Tirkiyeyê jî, ji serdema 'înorganîk' û xewna fetret û 'entriqeyên nazîst' rizgar bike.

*[1] Çîroka Vejînê.... Weşanên Serxwebûn*

# Hebûn û vejîn

Remezan Olçen



Salên 70yî, mîna gelek deverên cîhanê, bayê şoreşê li Tirkiye û Kurdistanê jî da.

Xwendekarê kurd Abdullah Ocalan ê ji pêşengên şoreşa Tirkiyeyê, Mahîr Çayan, Denîz Gezmîş û hevalên wan bandor lê dikin, biryarê dide ku dawî li xewa dehê salan bîne... Û bi ketina sala 1973yan Rêber Apo dikeve nav lêgerînekê... Navenda vê tevgera ku wê bi demê re mohra xwe li dîroka Kurdistan, herêm û cîhanê bidaya, paytexta Tirkiye Enqereyê bû.

Her tişt ji civîna Bendava Çubûkê dest pê kir... Sala 1976an li Dîkmena Enqereyê êdî koma ku ji çend şoreşgeran pêk dihat, gihîşt wê astê ku biryara rêxistinbûnê bide.

Endamên vê komê gihîştin wê bawerîyê ku divê beriya her tiştî tirsa dehê salan ku di serê kurdan de bi cih bûyî, ji holê were rakirin.

Lewma yek bi yek berê xwe didin bajarên Dîlok, Amed, Riha, Dêrsim, Batman û Serhedê. Hêzên ji vê tevgera şoreşger haydar bûn, hê di rojên pêşî de ketin nav tirs û xofeke mezin. Difikirîn ku ew ê bi kuştina çend pêşengan dawî li vê tevgerê bînin..

18ê gulana 1977an li bajarê Dîlokê, yek ji damezirînerên koma Apoyî, şoreşgerê enternasyonalîst Hakî Karer di encama êrişeke bêbext de şehîd dibe. Yên êrişî Hakî kir bi qasî ku xwestin wî bê bandor bikin, her wiha pîlan dikir ku bi qetilkirina wî, ew ê hemû endamên komê nas bikin û yek bi yek wan ji holê rabikin.

Abdullah Ocalan ê vê pîlana dewleta tirk dibîne, ji bo bîranîna Hakî Karer biryareke dîrokî dide. Û di nav demeke kurt de, tevger li her devera Kurdistanê belav dibe.

Di encama xebatan de, ciwanên Apoyî gihîştin wê qenaetê ku êdî dema partîbûnê hatiye... Û roja 27ê Mijdara 1978'an, 23 kadroyên pêşeng li gundê Fîsê yê navça Amedê Licê kom dibin. Ev civîn weke kongreya damezirandinê tê lidarxistin. Tevgera ciwanên Apoyî, di vê kongreyê de xwe weke Partiya Karkerên Kurdistanê PKKê bi nav dikin.

Piştî 2 sal di ser damezirandinê re derbas bûn, cûntaya leşkerî ya 12ê Îlonê pêk hat. Piraniya pêşengên PKKê hatin girtin û di êşkenceyên herî giran re derbas bûn. Bendewariya cûntayê ew bû ku bi lêdanê ew ê bandorê li biryardariya kadroyên PKKê bike û wan mecbûrî teslîmiyetê bike. Mazlum Dogan, Ferhad, Necmî, Mahmûd, Eşref, Kemal, Xeyrî, Alî û Akif bi gotina 'Berxwedan Jiyan e' xewn û xeyalên faşîzmê têk birin.

Rêber Apo berxwedana zindana Amedê weke bang û fermana bilindkirina têkoşînê bi nav kir. Û 15ê Tebaxa 1984an bi pêşengiya Mahsum Korkmaz guleya pêşî li Eruhê hat teqandin. Êdî çerxa dîroka Kurdistanê hat guhertin; partîbûn, berxwedan, şerê çekdarî.



Salên 1990î salên serhildanên gel bûn. Hingê li qadan ev dirûşm bilind dibû: PKK gel e gel li vir e. PKKê tevî ku êdî artêş û destekeke mezin a kurdên li her çar beşên welat û derveyî welat bû jî, ji mezinkirina şer zêdetir li çareseriya siyasî digeriya.

93 bû sala agirbesta yekemîn, piştre 96 û 98. Lê bersiva dewleta tirk û zilhêzan bû komplo. Rêber Apo 9ê Cotmeha 98an ji Sûriyeyê hat derxistin. Li Ewropayê hewl da çareseriyekê bibîne. Lê wê demê jî hewldanên wî bê bersiv man. Û sibata 99an, 15'ê Sibatê kompiloya navneteweyî li Kenyayê bi girtina Rêber Apo û radestkirina Tirkiyeyê encam da.

Tevî vê jî Rêber Apo lêgerîna çareseriyê domand. Pêşî li şerekî hîn mezintir girt.

Paradîgma guhert. Tevgera Azadiyê ji nû ve birêxistin kir. Li hemberî moderntîteya kapîtalîst alternatîf danî; moderntîteya demokratîk. Rêber Apo çiqas ji bo aştiyê fersend çêkir, dewletê bi şer bersiv da. Pêvajoyên 2009-2013-2015 wisa hatin hebakirin. Şer kûrtir bû. Êş mezintir bûn. Lê PKK her ma û têkoşîn her mezintir kir. 2024an careke din bi înîsiyatîfa Rêber Apo ji bo lêgera siyasî pêvajo hat bipêşxistin.

Rêber Apo bi banga 27ê Sibata 2024an xwest PKK xwe bi awayekî dilxwaz fesix bike.

Got; dewra wê temam bûye, karê xwe kiriye, peywira xwe aniye cih. Got; PKK'ê hebûn misoger kir û dora azadiyê ye. PKKê jî bi telîmat û perpektîfên Rêber Apo bi birêvebirina wî gulana 2025an kongreya xwe ya awarete ya 12an çêkir û rêxistina xwe fesix kir.

Desthilatdarên tirk ji bo dawî li PKKê bînin, sala 84an 72 saet dem nîşan didan. Bi sedan 72 saet derbas bûn, bi dehan desthilatdar û sererkanên dagirker ji holê rabûn. Lê 47 sal in PKK bi ruhê di nav gelê kurd û bindestan de ava kirî her zindî ye. Ew navê hebûna gelê kurd çêkera Cejna Berxwedana Neteweyî ye. Cejna we pîroz be.

# Sermuzakerevan Rêber Abdullah Ocalan e

## Tirkiye bi banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a 27ê sibatê re, ji bo meseleya xwe ya esasî ya pirsgireka kurdî li rêbazên çareseriya navxweyî digere. Li rêyên lihevkirinê digere ku ev bi çareserkirina pirsgireka kurdî dikare pêk were



Adar Gulan



Gelo mirov çawa dikare bi kûrahî dest bi honandina hevok û analîzên têkildarê vê pêvajoyê bike ku pêvajoyê li ser esasê çawaniya wê bi tevahî hûrguliyên wê bi raya giştî bide fêmkirin? Hefteya borî çavên herkesî li çûyîna komîsyonê ya Îmraliyê bû ku me henaseya xwe girtibû û li benda xeberek xweş a vegera komîsyonê ya ji girava Îmraliyê bûn. Bala raya giştî ya Tirkiyeyê li ser çûyîna komisyonê ya Îmraliyê hatibû kilîtkirin. Çûyîna komîsyonê ya girava Îmraliyê, li seranserê dinyayê deng veda. Piştî hevdîtina komîsyonê ya bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re pêk hatî û şûnde, hat gotin ku pêvajoya aştî û civaka demokratîk derbasî qonaxeke nû ya avakirina hêza çareseriyê bûye. Ev xebera xweş, li ba gelê kurd bû sedema kêfxweşiyê. Eger ku em îro vê hevokê tînin ziman, di wateya erênî de gava hat avêtin girîngiya xwe gelek e.

Bêguman ev gav hema wilo ji nişka ve nehatiye avêtin. Hetanî kêliya pêkanîna wê jî, di gelek qonaxên zor û zehmet de bi dehan caran li astengiyan qelibî. Di encama hewldan, ked û têkoşîneke mezin a Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê de pêkhatina vê hevdîtina rasterast gelek wateyên xwe yên cuda hene. Piştî vê gava girîng a çûyîna komîsyonê ya Îmraliyê û hevdîtina bi rêzdar Ocalan re pêk anî, rê li ber gelek nîqaşên pûç ên di çapemeniya tirk de hat girtin. Çapemeniya tirk ji nîqaşkirina pêvajoyê zêdetir, muxatabgirtina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, bi nîqaşên provakatîf raya giştî gur dikir. Piştî hevdîtina komîsyonê ya parlamentoyê pêşî li ber wan nîqaşan bi tamamî hat girtin. Ruhê pêvajoyê veguherî rengê esasî yê xeta çareseriya demokratîk. Rê li ber nîqaşên spekulatîf bi yek carê hat girtin. Abdullah Ocalan, weke sermuzakerevanê pêvajoya aştî û çareserkirina pirsgireka kurd hat guhdarîkirin. Sermuzakerevanê pêvajoya çareseriyê; Rêber Abdullah Ocalan e. Ocalan; ewe aktorê sereke yê pêvajoyê muhatab hat girtin.

Tirkiyeyê bi banga Rêbere Gelê Kurd Abdullah Ocalan a 27ê sibatê re, ji bo meseleya xwe ya esasî ya pirsgireka kurdî li rêbazê çareseriya navxweyî digere. Li rêyên lihevkirinê digere ku ev bi çareserkirina pirsgireka kurdî dikare pêk were. Di vê dema tevlîhev a derbasbûnê ya demokrasiyê de, pêdiviya kurdan a bingehîn bi parastina hiqûqê û misogerkirina mafên zagonî heye ku divê ev maf pêk werin. Yan jî pêvajo bi pêşnakeve. Ji vir û pê ve tiştên esasî ku bên kirin naskirina mafê kurdan e ku divê bên misogerkirin. Pêkanîna edaletê, naskirina hemwelatîbûna azad, wekheviya civakî ya gelê kurd û gelê tirk, pêkanîna hiqûqê û vesazkirina zagonên bingehîn e. Mafên kurdan divê bi guhertina qanûnan werin parastin ku pêvajo li ser herdu lingan bimeşe. Ji dûr ve temaşekirina li pêvajoya aştî û civaka demokratîk, dê pêvajoyê ber bi encamên serketî ve nebe. Ji bo wê jî pêdivî bi fêmkirin, nirxandinên kûr ên berfireh heye ku gavên dualî yên ji bo çareseriyê bên xurtkirin. Bi danûstandinên li gel civakê, lidarxistina civînên girseyî yên bi hemû bawerî û rengên civakê re pêvajo di nav pêkhateyên cuda yên civakê de jî bê nîqaşkirin. Ji bo fêmkirina tevahî rehengên esasî yên vê demê, divê dewlet astengiyan ên li ber siyaseta demokratîk bi temamî bi dawî bike ku civak bi nîqaşên xwe tev li pêşvebirina aştiyê bibe. Gengaz e ku saziyên dewletê, ji bo vê yekê xebatê bikin. Pêwîst e civak ruhê vê pêvajoyê, ku di stratejiya xwişk û biratiyê ya gelê kurd û tirk de ji nû ve şîn dibe, rastiya vê demê bi serketina herdu aliyan bigire dest. Pêkanîna vê jî bêguman bi rawestandina şer û avakirina aştiyê ye. Bi nijadperestiyê, ji pirsgireka kurdî re çareserî nayê dîtin. Veçirandin û hûnandina vê pêvajoyê, dê bi pêşxistina demokrasiyê pêk were. Civak ji dewletê, avêtina gavên şênber dixwaze. Di dîrokên cuda yên cîhanê de pêvojoyên aştiyê bi beşdarbûna aktorên civakî bi ser ketine, encam dane. Ji bo pêvajoyê divê nêrîn û gumanên gelê kurd li ber çavan bên girtin. Girêdayî birêveçûna şekil û şemalê pêvajoyê rexneyên gel werin guhdarîkirin. Li ba gelê kurd bawerî bi dewletê nemaye. Bi gotina dayikeke aştiyê ku beriya bi çend rojan xemgîniya xwe anî ziman; “Serok Apo, ji bo me kurdan dinya fireh kir, kurd bi tevahî dinyayê dan naskirin, lê me ji bo wî tiştek nekir mixabin ew hê di zindana Îmraliyê de dîlgirtî ye.”

Pêvajo, 27ê sibata 2025an, bi wêrekiya hêza jixwebawer, bi ramanek pêşketî ku temsîla azadiyê ye, bi biryarek jidil gava xwe ya pêşiyê li pêşberî hemû cîhanê avêt. Ji tevahiya dinyayê re peyama “Em ji çareseriya demokratîk re amade ne” da û dest bi meşa xwe ya çareseriya rizgariyê kir. Bi vê perspektîfê rêya aştî û demokrasiyê hilbijart. Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê, di çareseriya siyasî, demokratîk û pêşxistina diyaloga navbera hemû pêkhateyan de bi israr e. Kurd; çima aştiyê dixwazin? Em çima têkoşîna aştiyê didin ? Helbet sedemên wê hene, ji bo çareserkirina meseleya kurdî; ji bo avakirina komarek demokratîk têdikoşin. Piştî wê banga dîrokî ya Ocalan, diviyabû îktîdara AKPê gavên şênber biavêta; rê li ber siyaseta demokratîk vekira. Mixabin pêvajo heta niha yekalî meşiya; lê ji îro û şûnde wiha naçe serî. Çareserî, bi avêtina gavên yekalî re serkeftin pêk nayê. Aştî bi hincetan, bi fen û fûtan pêk nayê. Qesra Beştepeyê li hemberê dilsoziya banga 27ê sibatê û gava dîrokî ya 11ê tîrmehê ku li şikefta Casenê çek hatin şewitandin heta îro gaveke cidî ya pratîkî neavêtiye. Li beramberî van gavên dîrokî, îktîdara AKPê ji bo çareserkirina pirsgireka kurdî ti plan û proje bi pêş nexistiye. Pêvajoya çareseriyê heta niha bi avêtina gavên yekalî, bi saya ked û israra rêzdar Ocalan û hewldanên Tevgera Azadiyê ku raber dike xwe li ser piya girtiye! Liserpiyamayina pêvajoyê, nayê wateya ku pêşveçûyîn çêbûye. Pêvajo, li ser lingekê dimeşe. Hewldana qesrê ew e ku pêvajoyê li gorî berjewendiyên desthilatdariya xwe bi rêk û pêk bike. Hesabên wê, li gor berjewendiyên mana wê ya ser îktîdarê ne. Raberkirina polîtîkayên bi vî awayî yên astengkirina siyaseta demokratîk, pêvajo anî ber xitimandinê. Çavkaniya vê nêzîkatiyê, dewama polîtîkayên mêtinger e. Diviyabû ji zû ve pêvajo derbasî qonaxa 2yemîn bûbûya. Ji ber ku îktîdarê peywira xwe neanî cih û xwe neda ber barê çareseriyê li gor ku hatibû plankirin nemeşiya. Ew çîrokên berê her carê dubare dikin. Ev israra siyaseta neçareserkirinê ya pirsgireka kurdî ye. Gelê kurd, bi îktîdara AKPê ne bawer e. Nexasim jî jinên kurd!

Pêvajoyên wiha ku qonax bi qonax çareserî pêk tê, bi avêtina gavên dualî li ser piyan dimîne. Pêvajo bi beşdarbûna dînamîkên sereke yên navxweyî/civakî, sazî û dezgehên jinan û mafên mirovan bi ser dikeve. Pêvajoyên wiha hesas ên çareseriyê li gorî anketên hinek şîrketan nayê birêvebirin; li gor peydakirina rêyên çareseriyê bi pêş ve diçe. Divê ev pêvajo jî mîna yên berê, nebe qurbana berjiwendiyên desthilatê. Stûnên esasî yên dewrdana derbasbûnê bi tevlîbûna hemû pêkhateyên civakê li hevkirina civakî pêk tên. Demokrasî, aktuelkirina hemû beşên cuda yên civakê ye.

Ji pêvajoyê bendewariya her aliyekî cuda ye. Ji bo serkeftina pêvajoyê, kî çi kiriye aşkere ye. Ma ya herî girîng jî ne ev e? Aliyê Tevgera Azadiyê di qonaxên pêvajoya salekê de gavên micid ên bi wêrek avêtin, li ser vê bingihê û hişmendiyê pêvajo heta îro bi keda yekalî bi pêş ve çû. Bi avêtina gavên şênber pêvajo, ji provakasyonên muhtemel hatiye parastin. Tevgera Azadiyê, hemû gavên xwe bi wêrekî avêtin ku Pêvajoya Aştî û Civaka demaokratîk heta vê astê anî. Ji bo Tevgera Azadiyê ev pêvajo stratejîk e.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan; bi aqilê yekîtiya neteweyî ya demokratîk di nav vê aloziya Rojhilata Navîn de hevsengiyên heyî yên statûkoperest veguherî hêza pozîtîf a çareseriya neteweya demokratîk. Di vê hevsengiya nû ya pêşxistina aqilê kurdî yê yekîtiya demokratîk de; kurd pêşengiyê ji avakirina demokrasiya Rojhilata Navîn re dikin. Saxlemkirina ewayên bingehîn ên civaka demokratîk, li ser vî esasî bilind dibe. Pêkanîna vê, erêkirina civaka demokratîk e. Di wateya hewldana avakirina pergaleke nû ya entegrasyona demokratîk de, dê bi rêya hiqûqê misoger bibe. Ev şêwaza nû ye serdemê ye; îfadeya têkoşîna siyaseta demokratîk ev e.

Dewlet ji çeka destê kurdan ditirse. Tirsa dewletê ji dîrokê tê. Li gorî hişmendiya dewletê ya mêtinger divê hêza parastina kurdan tune be. Divê kurd nebin xwedî hêza parastinê ya rêxistinkirî. Parastina kurdan ji bo xwe weke gefa “ewlehiyê” dibîne. Rayedar û wezîrên dewletê ji bo ku kurdên rojavayê Kurdistanê bêçek bikin, li dinyayê dewletek nema ku xwe navêtin ber deriyê wê. Roj nîne ku li ber deriyê dewleteke bazara tesfiyekirina rojavayê Kurdistanê nekin. Rojava, kirine mijara bazarê ya pêvajoyê. Dewleta tirk di polîtîkaya antî-kurd de bi israr e. Di mijara înkar û asîmîlasyonê de sînoran nas nake. Siyaseta înkarkirina hebûna gelê kurd, dewam dike. Divê bê zanîn ku Rojava qibleya hemû kurdan e. Armanca dewletê ji çareserkirinê wêdetir, tasfiyekirina sazî û destkeftiyên Tevgera Azadiyê ye. Pêvajo ji hêla dewletê ve rast nayê nîqaşkirin û tê manîpulekirin.

Tirkiye di navenda aloziya Rojhilata Navîn de bi qeyranên mezin re rû bi rû ye. Desthilata vî welatî heta niha jî pirsgirêkên civakê re, ji pirsgirêkan jinan re çi çareserî dîtiye? Îktîdara AKPê ji niha û pêde wê nikaribe hêza xwe konsolîde bike. Mana wê ya li ser îktîdarê zehmet e. Li Tirkiyeyê saziya siyasetê ji hunera afirîneriyê dûr ketine. Dewlet divê dev ji rêbazên xwe yên klasîk berde, rast nêzî pirsgireka kurdî bibe.

Hikûmeta dewleta tirk di asta navxweyî û navneteweyî de ji bo ku aştî pêk were heta niha çi xebat kiriye? Herkes li bendê bû ku dewleta tirk ji biryara bidawîanîna şerê çekdarî ya Tevgera Azadiyê, weke fersendeke dîrokî ya stratejîk bibîne û gavên hiqûqî li pey hev biavêje. Lê mixabin heta niha ti gav nehatine avêtin, aliyê çareseriyê mijûl dike.

Daxwaza kurdan a çareseriyê aşkere ye; misogerkirina mafê hêviyê û pêkanîna hemwelatîbûna azad e. Têkoşîna gelê kurd ji bo avakirina komareke demokratîk e. Pêşvebirina aştiyê ye. Di vê pêvajoyê de ciwan bi taybet jî jinên ciwan di nav lêgerînên alîkar ên çêkirina rêyên çareseriyê de rol girtiye. Têkoşîna jinên ciwan; wateya xwe gelek e. Aşkere ye ku li Rojhilata Navîn serdemeke nû dest pê dike. Demokratîkkirina Tirkiyeyê, helbet wê bandorê li tevahî dînamîkên civakî yên herêmê bike. Hevsengiya nû dê bi xwe re, pergaleke nû bîne. Bila ewrên reş ên li ser xaka Kurdistanê belav bibin, bila Ronahiya Rojê di dilê mirovên vê xaka qedîm de bilerize, şewq bide…

# Êşên kurdan, xwe-nasiya tirkan

Prof. Dr.
Abdulîllah Polat



Pirsgirêka kurdan li Tirkiyeyê bi salan e ji perspektîfên siyasî, ewlehî, hiqûqî û aborî ve tê nîqaşkirin. Piraniya van nîqaşan aliyê herî kûr û girîng ê pirsgirêkê paşguh dikin; rewşa psîkolojîk a sedan salan a kurdan, rûmeta wan, nerazîbûn û westandina wan. Ger çareseriyek mayinde tê xwestin, divê ev aliyê jibîrkirî niha bi awayekî cidî li ser were sekinandin. Tişta ku kurd dijîn ne tenê paşguhkirin an terikandin e; ew wêraniyeke psîkolojîk a kûr e ku ji ber zêdetirî sedsal e înkar, asîmîlasyon, veguherîna bi zorê, gendeliya ziman, dorpêça ewlehiyê û polîtîkayên koçberiyê çêbûne. Ji ber vê yekê, kurdan bi tevahî dev ji daxwaza xwe ya jiyana bihevre li van herêman bernedaye. Berovajî vê, wan pir caran bi yekalî barê vê xwestekê hilgirtiye ser xwe. Wan zirar daye dewleta tirk, zimanê tirkî, dîroknivîsiya fermî û hesasiyet, tirs û serbilindiya tirkan, lê wan heman bersiv ji tirkan wernegirtiye.

Îro, wêne aşkere ye: Kurdan bi hînbûna hema her tiştî li ser tirkan ev jiyana hevbeş berdewam kiriye. Niha dem hatiye ku tirk xwe perwerde bikin. Ev ne tenê gaveke siyasî ya pêwîst, lê di heman demê de ferzeke psîkolojîk û exlaqî ye jî. Di tevahiya dîrokê de, têkiliyên tirk-kurdan qet bi dijminatiya yekalî yan wekheviya yekalî nehatine xuyakirin. Ji serdema Selçûqiyan ve, wan li Milazgir, Çaldiranê û gelek şerên din bi hev re mil bi mil şer kir; ji Eyûbiyan bigire heta Osmaniyan, ew di bin sîwana îslamê de mil bi mil jiyan; paşê bi damezrandina komarê re, ew rastî polîtîkayên dijwar ên navendîkirin û zordariyê hatin.

Tişta ku ji bo kurdan girîng e bandora van guhertinên dîrokî li ser derûniya wan e. Ji ber ku her têkçûn ne tenê encamên xwe yên siyasî hebûn, herwiha zirarê da hesta wan a rûmet, aîdiyet û baweriyê jî.

Gotina fermî di salên destpêkê yên komarê de yan bi tevahî çanda kurdî paşguh kir an jî ew wekî ‘pirsgirêk’ û ‘gef’ bi nav kir. Daxuyaniya ‘kurd tune ne, tenê tirkên çiyayî hene’ ne tenê îdiayek îdeolojîk bû, êrişek psîkolojîk a aşkere bû jî ku hebûn, nav û nasnameya gelekî înkar kir. Pîr, memûr û mamosteyên ku digotin ‘Zimanê kurdî tenê ji çend peyvan pêk tê, zaravayekî sade ye; ew mîna zimanê mirovên şikeftan e’, ne tenê nêrînên xwe dubare dikirin, bi vê derewa fermî ya ji jor ve di hundirê xwe de digirtin û di zarokên xwe de diçandin.

Ev celeb înkarkirin di kesayetiya kurdan de hestên jêrîn diafirîne: ‘Ez wekî ku ez im nayêm qebûlkirin’, ‘Ger ez xwe kurd pênase bikim, ez ê bêqîmet bêm hesibandin’, ‘Ji bo ku ez werim qebûlkirin, divê ez mîna kesekî din xuya bikim’.

Pirsa germ ku kurd pir caran dipirsin ‘Me çi kiriye?’ îfadeyek vê hestê ye. Ev pirs bi dehan pirsên din jî dihewîne: ‘‘Me çi kiriye ku mîna zarokên neviyên me yên mezin werin dermankirin? Me çi kiriye ku bûye sedema qedexekirina zimanê me û krîmînalîzekirina stran û şînên me? Me çi kiriye ku bi zorê ji welatê xwe werin sirgûnkirin? Me çi kiriye da ku têgiha ‘hemwelatîbûna wekhev’ tenê dahênanek hunerî bimîne?‘’

Ev pirs qet bi awayekî aşkere, bi rastî û mirovî nehatine bersivandin. Heta ku înkar berdewam bike, ev pirs dê di derûniya kurdan de wekî pirsgirêkek çaresernekirî bimînin. Tepeserkirina ziman yek ji aliyên herî biêş ên vê pevçûnê ye. Derxistina zimanê kurdî ji jiyana giştî, dabeşkirina wê wekî ‘zimanek nenas’ di pêvajoyên parlementoyê de, qedexekirina wê ya virtual li dibistan, dadgeh û ofîsên hikûmetê ev hemû ne tenê binpêkirina qanûnê bû, lê di heman demê de şermezariyek kûr jî bû. Zehmetiya xwendina helbestên kurdî li malê dema ku ew li kolanê bi dengekî bilind dihatin xwendin; nekarîna xwendin û nivîsandina bi zimanê dayikê; tawanbarkirinên ‘cudakariyê’ ji bo daxwaza perwerdehiyê bi zimanê xwe ev hemû bi salan heman peyam dubare kirin: ‘Zimanê we xirab, paşverû û bêmedenî ye.’ Vê peyamê hesteke şermê çêkir di hişê wan de.

# Yew şar gandar beno

Peydabîyayîşê PKK'yî têna peydabîyayîşê rêxistinêke nîyo, eynî wext gandarbîyayîşê şarê kurdî yo û qedîyayîşê bendeyîya bi hezaran serran o

Merkezê Xeberan



Erdê Kurdîstanî bi hezaran serrano binê bandora dewletanê serdestan de yo. Kamîye, kultur ve ziwanê kurdan raştê her tewr zext û tedayan ameyî. Estîya şarê kurdî raştê her tewr tehlukeyî ameye.

La kurdan cuya kolekîye qebûl nêkerde û vera zordestîye têkoşînêko bêhempa kerd. Seke zanîyeno filozofo frîgyayij Epîktetos verê cû "bende" bî û dima ra resa azadîya xo.

O qîymetê azadîye her kesî ra zêdeyêr zano û wina vano "keso ke efendîyê xo nîyo, nêeşkeno azad bibo." Kurdan zî seba ke efendîyê xo bibê, xover da û verê serdestan vileyê xo çewt nêkerd.

Xoverdayîşê kurdan de bêguman cayê PKK'yî cîya yo. PKK têna têgêrayîş nîyo, eynî dem îdeolojîyo ke kurdan, pelixîyayoxan û bindestan xelisneno yo. Senî ke roj dinya roştî keno, PKK zî raya şaran û kamîyanê pelixîyayeyan roştî keno. Sayeyê ey şarê kurdî hem xo rêxistin kerd, hem xo bedilna, hem ravurîyayîşo komelkî viraşt hem zî hemverê serdestan û kolonîzatoran xoverdayîşêko bêemsal kerd. Coka merdim eşkeno vajo ke serra 1978 tarîxê şarê kurdî de serra "gandarbîyayîşî" ya.

Sere de Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalan heme şorişgeran armanc kerd ke şarê kurdî azad bikerê. Seba nê armancî bedelê pîlî dayî. Mîsal Mazlum Doganî zîndanê Amedî de leşa xo vêşnaye. Seba ke erdê Kurdîstanî "kolonî" nêbo, seba ke şaro kurd "bende" nêbo, seba ke kamîye û kulturê kurdan teslîmê asîmîlasyonî nêbo, ey cuya xo ra fek vera da. Ey verê zulmkarî de zanîyê xo nêronayî.

Ey hertim wina vatêne: "Armancê ma yo tewr tay xoserî ya". Ey giranîye dayêne xoserîya şarê kurdî. Ey zanêne ke zulmkarî na cografya de seba çinkerdişê şarê kurdî xeylêk metodî şuxilnayî. O herêma Dêrsimî ra bî. Ey zanêne ke na herême de qirkerdişo gonîn qewimîya û bi hezaran kirmancî bi hovî ameyî qirkerdene. Ey rêça Seyît Rizayî taqîp kerde û mêrasê têkoşînê ey aver berd.

**Têkoşînê Kemal Pîrî**

Şorişgeranê ke seba xelasa pêro şaranê bindestan têkoşîn kerd ra yew zî Kemal Pîr bî. O Gumuşxane ra bî û ciwanîya xo de dîsîplînê sosyalîzmî qebûl kerd.

Ey zanêne ke têna sosyalîzm eşkeno şaran bixelesno. Ey fikrîyêne ke ganî heme karkerê Tirkîya û Kurdîstanî peştî bidê yewbînî û vera sinifanê serdestan têkoşînê hemparî bikerê. Ey dî ke PKK fikrê ey temsîl keno.

Coka tewrê xoverdayîşî bî. Ey bawer kerdêne ke rojêke Tirkîya û Kurdîstan de heme şar û îtîqatî do bixelesîyê. Seba nê armancî zîndanê Amedî de xover da û serra 1982 de netîceya rojeyê mergî de şî heqîya xo. Ey peyê xo de mêrasê xoverdayîşî yo rûmetdar verada. Ewro domanê Kurdîstanî wayîrê nê mêrasî vejînê û raya sosyalîzmî ra şinê. Ewro yan siba têkoşîno sosyalîst do serkewte bibo û heme şarê bindestî do biresê azadîya xo.

# Cuya komunale



Zaza Cebelî

Bi verênî ra, verê verkan ganî ma rewşa raştîya xo bizanê û raştîya ma çi ya û raştîya şarê ma çi ya. No ware de bingeyê înşaya newî est o û na zî ma çiqas nizdîyê nê bingeyî yê. Eke merdim bi rewşa raste bifikirîyo, şarê ma nê tewr çîyan ra xerîb nîyê û dûr zî nîyê. Awanbîyîşo newî hem zaf asan o û hem zî zaf zor o. Çîy rê asan o, çimkî kurdî heyana ewro nêresayê rewşa netewe û netewe-dewlete nêbîyî û dîrok de her wext rewşa kome û komunalîzmî ra vîyartî.

**Formê komunî**

Konfederasyonê eşîretan rasti ra, bi demokrasîyanê sîteyê sûkan, mezhebê merdimayî ra, Rojhelato Mîyanênî de komara dewrişanê harîcî, îsmaîlî, karmatî, mazdekî, elewîyan dormareyê pêxemberan ra ewlîyayan ra kom bîyêne. Xiristîyanan de zî, kilîsan mîyan de hîyarerşîk ra dûrî cuyî bîyêne. Ewropaya pêroyine de komunî, meclîsî, ceribnayîşê konfederasyonî, Îtalya de meclîsa sûkan, konfederasyonê Swîs, Komunê Parîsî, Emerîka de meclîsê bajarekî, Îspanya de seksîyonê taxan, komunî û sewbîna nimuneyî zî zahf î.

**Herimnayîşo komelkî**

No sebeb ra ceribnayîşê bingeyê verênî est o. Hînê ewta de çi maneno? Tewr muhîm zî rêxistinî ya û bawerî ya. La ma çiqas rêxistinî yê û çiqas ma bawerî daya şarî û komelkîya xo. Nê her di krîterî zaf muhîm î. Eke ma her di krîteran ser o nîqaş û xebate bikerê, vernîya ma de çew nêeşkeno vindero. Tewr muhîm zî vernîya ma de rewşa herimnayîşê komelkî est a. Çi yo na rewşa herimnayîşê komelkî? Bi serrano ke şero taybet wazeno ke kurdan ser o kayanê qilêrinan kay bikero. Bi taybetî şerê taybetî xususî herêma bajarê Amedî weçînaye. Bajarê Amedî dîrok de her wext cayê xo yê xoverodayîşî destanê camêrdî reyde nuşt û morê xo ana dîyar kerd heyana ewro.


**Şero taybet**

Şerê taybetî heyana ewro bi qirêjîya xo ra zaf çîyê xirabî kerdî û dewam keno. Eke ma rewşa raştîya xo û nînik ra biewnê, heme çîyî rewşa zelalî ra asenê. Damara komelkî rêza tew zeyîfe û exlakî ya û polîtîk a. Ewro Amed de rewşa tîryakî, fihûş û sewbîna çîyan sereyê xo giroto şiyo. Nê heme rewşan mîyanî de ciwanî asenê. Nê ciwanî zî zafîra gedeyê ma yê û ciwanê ma yê. Şero taybet ameyo heyana zifqêra berdê ma û mîyanê keyeyê ma. La çi heyfo ke nê gede û ciwanî ê ma yê, korê zî welatperwer î. No sebeb ra ganî ma verê verkan mîyanê keyeyê xo û verê berê xo safî bikerê. Na zî sewbîna tewr sloganîk û dogmatîk beno. Ganî ma nê heme çîyan bîyarê ver çimanê xo, weş bifikirîyê û ser o muşewre bikerê. Ma senî û kam ca ra dest pêbikerê?

**Dermanê heme çîyan rêxistinbîyayîş o**

Eke ma rêxistinîya xo rast saz bikerê, vernîya ma de û şarê ma de çew nêeşkeno vindero. La senî rêxistinîya xo weş saz bikerê? Dermanê nê rêxistinbîyayîşî zî bawerî ya. La na bawerî senî virazîyena? Ez bawer kena ke dayîşê nê bawerî zaf asan o. Ganî ma ewil ra bawerîya xo bikerê, mezgê xo de bawerî bivirazê. Goreyê vatişanê heme kesan vanê "Ganî soriş verênî ra zîhnîyet de bêro bedilnayîş". La vatişan ra têna çîyêk nêbeno. Ganî nê vatişî pratîze bibê. No ware de heme çîyî girêdayeyê prosesê newî yê. Eke proseso newe rengê xo dîyar bikero, heme çî peyda pey yeno.

Nê se serrî yo ke dewleta tirke, kurdî bindest kerdî. La no zîhnîyetê tirkperestan rewa – rewe nêqedinîyeno. No ware de zî wext lazim o. Wext dermanê heme çîyan o. Çîyo ke bêwext beno, nêmcet beno û sernêkeweno. No sebeb ra ma bawer kenê ke heme çîyî weş bivêrê. Vîyartişê weşî de zî kede û xîret lazim o. Eke her kes bi gorê xo kede û xîret bikero, heme çîyî weş benê.



# Rengê cuye û vengê azadî



Nesrîn Namdar

Tarîxa şîdetê mêrdî yê serê cinî bi awanbîyayîşê pergala pederşahî ra dest bi ci kerdo. Têduştîya ke dewrê seydvanî-komkerdoxî de mîyanberê cinî û mêrdî de bîye, bi amyayîşê dewrê zîret û bazirganî dir açarya serdestî û bêedaletîya mêrdî ser.

Mêrdeyê ke tenê destê înan de qewetê înan û aletê ke pê heywanî kiştêne bîyê dimayo ke însanî derbasê cuya cabîyayeyî benê û bazirganîya heywanan heta ê zîretî kona destê înan cinîyan ser de hikmê xo ronenê û şîdetê xo dest pê kenê. O şîdetê înan heta roca ma ya eyroyêne zî dewam keno.

Welatanê ke tede zîhnîyetê pederşahî serdest o de cinî rê cuye cehenem a. Çi heyf ke Tirkîya zî ê welatan ra yew a ke zîhnîyetê pederşahî serdest o û hukmê edaletî yê pergale çimanê xo şîdetê mêrdî yê serê cinî ra gêno, nê sebebî ra zî hema vace her roc qetilkerdişê cinîyan yeno şinawtiş. Heta wina bîyo ke tenê kiştişê cinîyan de nêmanenê, henî mêrdan ra ke qayîşê însanetî xo ra visnayo, bi fikro ke ceza bidê hemsera xo tûtanê xo yê qican ê mehsuman zî kişenê. Mêrdeyo ke pederşahî ruh û zîhnîyetê ey dagir kerda cinî zey mal û îtaetkara xo vîneno. Loma wexta cinî hemverê tundîya ke hemserê aye sey aye de pêk ano vecîyo rastê heme awayî şîdetê mêrdî yena.

Mêrdeyo ke xo serdest, hêzdar û serê cinî ra vîneno vare ke cinî sey hemsere, hemcuye û hemraye xo bivîno, aye sey kole, xizmetkar û mecbûre xo vîneno. Loma wazeno cinî binê emrê ey de bo, hemverê zilm û şîdetê ey bêveng bimano û milê xo kerdişanê ey rê rono. Ma eşkenê vacê ke mêrdeyê ke di nê zêhnîyetî de yê zehf tira zî cesaret na pergale ra gênê.

Ey zanê ke hukmê edaletî yê na pergale paşta înan de yo û her şîdeto ke hemverê cinî pêk bîyarê bêceza maneno. Loma cinîya ke sebebêke yan çend sebeban ra biwazo heskerdeyê xo ra têra bibo yan zî bi awayêke têra bîya hetê ey ra yena kiştişî, cinîya ke sebebêke yan çend sebeban ra veradayîşê xo hemserê xo ra wazena yan zî eşkawa xo ey ra bido verradayîşî hetê ey ra yena kiştiş.

Helbet kiştoxê cinî tenê hemserê aye nîyo, kiştoxê aye reyreyan pîyê aye, birayê aye, mam û xalê aye yo zî. Heta mêrdeyî na yewe ra zî cesaret gênê, bêters û xo ra pêbawer benê, loma bi rehetî her qayde şîdet ro cinîyan kenê.

Rast a, welatê ke mîyanê xo de têduştîya zayendîya komelkî rûnaya estê la cinî kam heb welatî de bena wa bibo, baro giran ê cuyî milê aye ser de yo. Pîzeyê xo de weykerdişê tûtan, ardişê înan ê dinya, pîlkerdişê înan heme îrade û sebrêke zêde wazenê ke herdi zî cinîyan de est ê.


Cinî zerrezîz û zerretenik a. Cinî hetê îrade û sebrî de xurt a, xozahez û aştîwaz a. Cinî awankara keyî û komelî ya. Aye ke şekil dana komelî cinî bi xo ya. Hetê aye yê sosyalî û psîkolojîkî çiqas baş bo eşkena komelê xo zî hende başêr bikero.

Cinî rengê cuye ya. Bi heskerdişê xo, weşdîtişê xo, îradeyê xo, sebrê xo, edaletê xo, viraştoxîya xo, pawitoxî û aştîwazîya xo cuyînî xemelnena. Pergala pederşahe ke zehfrengî ra, têduştî û aştî ra tersena bi destê mêrdan wazena cuya komelî goreyê waştişê xo eyar bikero.

Cinî vengê azadî ya. Vatişê cinî aştî ya, têduştî ya, edalet û cesaret a. Na pergala ke azadî ra tersena wazena cinîya ke hemverê bindestî, şîdetî û kedwerî tîmî vengê xo vecena û heneqî qebûl nêkena bi destê mêrdan bido tersnayîş û bêveng verdo. Pergala dagirker a serdeste zana ke bêvengkerdişê cinî bêvengkerdişê azadî yo. Pergala dagirkere estbîyayîşê xo bi kedwerî û qedexeyan domnena loma cinîya azadîwaze ra tersena. Komelêke çiqas azadî û aştî ra dûrî bo emrê pergala kedwere hende derg beno.

Nê sebebî ra ma eşkenê vacê ke eyro roc Tirkîya de bi nê awayî hetê mêrdan ra zêdebîyayîşê kiştişê cinîyan polîtîk o.

Ma bi munasebetê 25ê Teşrîna Peyêne wayanê Mîrabalan bi hurmet anê xo vîr û înan ra vanê; şima rehet rakoyê, cinîyê kurdan têkoşîna şima domnenê.








Fatma Taşli Tunç

# Dîk me misilman e

Di salên 1980yî de,  li Amed , Êlih û Ruhayê gelek gundên êzdiyan hebûn.

Dema ku ji gund derketana û ji boyî kirîn û firotanê bihatana bajêr, her dem bi tirs û fikar bûn.

Ji ber misilmanê yobaz û cahil, yek bi tena serê xwe nikaribû bigeriya.

Tim çend kes bi hev re digeriyan.

Gelek caran bavê Şêx Husên, Şêx mîrza dema derdiket sûka Êlihê, simbêlê xwe yê dirêj di bin kefiya xwe de vedişart, da ku kes wî nas neke û zirarê nedinê.

Gelek misilmanê yobaz, digotin, nanê êzdiyan heram e, heywanê ku êzdî serjê bikin heram e.

Xwarin û vexwarina wan herame û fêkiyê nav zeviyên wan heram in.

Belê ez serê we neêşînim.

Rojekê ji gundê baxçecikê ku girêdayî Bismil a Amedê ye, xortekî êzdî, selika xwe tijî hêk dike û dikeve tirênê tê Amedê, diçe sûkê ku hêkê xwe bifiroşe û ji malê re, çay şekir û sabûnê bikire.

Selika hêka di destê wî de, li ber mizgefta mezin rûdinê ku xudbe belav bibe, ew jî hêkê xwe bifiroşe û here alavê xwe bikire û bigihêje tirêna êvarê.

Dema sofiyên rî dirêj û simêl qut, ji mizgeftê derdikevin, Ciwanê êzdî li selika hêka dinêre û li cimaeta li ber deriyê mizgeftê Kom bûne dinêre, bi dengekî nizim dibêje:

- Hêkê gunda hêkê teze , hêkê baş, hêkê gir.

Yek ji wî alî de bang lê dike.

-Ka were birazî,  Ka bîne, tê bi çi bidî ?

-Hema te go bi çi, bila wekî te be Xalo.

Bazara xwe dikin, sofî selika hêka radihêjê , perê ciwan didê, tam xatirê xwe dixwazim, yek ji nava koma wan, ciwan ê êzdî nas dike û diqîre.

- Hecî Hecî, ma tu xurifî yî?

Zilamê selika hêka di dest de, sar dimîne.

- Xêre heyran, ez çima xurifî me.

- Ma ne xwarin û alavê êzdiyan herame?

-Belê

-Ê mane ev kur êzdî ye!

Dema ku weha dibêje, mêrik selika hêka datîne û bang li xwediyê hêka dike,

Were kirîvo, ez nakirim! Ka perê min, a ji te re hêkê te, em misilmanin, ji me re herame, were hêkê xwe bibe, ez nastînim!

Ciwanê êzdî difikire ka çi bêje,


Bi gavê hêdî ber bi zilam ve diçe û bi dengekî nizm dibêje;

-Xalê Hecî, bi vê camiya ku hûn dibêjin mala Xwedê ye, erê mirîşka me êzdî ye, lê dîkê me misilmane.

Ê ji ber ku dîk misilmane , hêk jî ne heram in heyran.

Hema wê gavê Hecî radihêje selika hêka û di nava kolanên teng û kevirê reş re dilezîne, berê xwe dide malê û ji ber çavan wenda dibe.

Belê xwînerên ezîz û hêja, beriya damezrandina Rêxistina Partiya Karkerê Kurdistanê, bûyerên bi vî rengî gelek diqewimîn. Piştî îdolojî û felsefa Partiya Karkerê Kurdistan ê, gelek mejiyên qirêj  pak û zelal bûn.




# Tiştanok

Gelî hêjayan mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê kurd e ku berê di civat û şevbêrkên xwe de ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanokên xweş amade kirine. Em hêvî dikin ku bi dilê we bin.

***1-***Mamê mino
Gelek pelên wê hene
Lê ne dar e
Ew çi ye?

***2-*** Mamê mino
Heta tu lê nedî ew naçe
Bi lêdanê diçe
de bêje ew çi ye?



***Bersivên me ev in:***

**2-**Bizmar av **1-**pirtûk

# Şerîfa rastiya Şerîfo nas dike

**Pîra Ferfûr**


Şerîfo pêxwasekî mezine lê di dema dawî de piştî ku gelek kesên derdora wî rastiya wî nas kirin êdî nema dikaribû zû bi zû kesekî bixapîne. Şerîfo perîşan û bê pere li malê rûniştibû diponijî ka wê çi bike. Dema ku Şerîfa jê pirsî û got çi bela te ye tu gelekî diponijî û xemgînî. Bû îske îska Şerîfo û giriya. Şerîfa got; Qet xeman nexwe ez dizanim ku tu bê pere mayî. Ha ji te re vê gustîla min ji xwe bifiroşe û em pê debara xwe bikin heta Xwedê ferecekê bîne. Dema Şerîfa wiha got; borînî bi Şerîfo ket û got; Di dinyayê de ez qebûl nakim, ezê çawa gustîla te ya zewacê bifiroşim. Şerîfa kir û nekir nikaribû wî qayil bike.

Piştî Şerîfo ji mal derket, Şerîfa bere xwe da Zêker da ku gustîla xwe bifiroşe lê derkete holê ku Xelefê di wir de pêxwazsî û fen û hîle kiriye. Gustîla wê ya zewacê jî derket




a

# XAÇEPIRS




## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ VE

***3-*** Çavkaniya jiyanê ***5-*** Xwarina sewalan ***7-*** Hiş ***8-*** Sewaleke ji bo hirî û goşt tê xwedîkirin ***9-*** Fêkiyekî kurdistanê ***13-*** Hunermendeke jin( …caf. ) ***14-*** Bere ***16-*** Hêwîbûn. ***19-*** Hunermendeke kurd ji jinên pêşeng ên dengbêj(….Simo) ***20-*** Yan jî ***21-*** Kurteya navê Emîne li ba kurdan. ***22-*** Markeyeke otomobîlan. ***25-*** wekî din ***26-*** sewalên ku ne di dema xwe de ji dayik dibin ***28-*** Li ba gele Mezopotamyayê xwedawenda evin û şer

## JI JOR BER BI JÊR VE

***1-*** Semboleke têkoşîna jinên kurd
***2-*** Kelek
***3-*** daçekek
***4-*** Nîşe
***6-*** Wêne
***10-*** Cih
***11-*** Ajanseke jinên kurd
***12-*** Partiyeke kurdan li bakurê Kurdistanê
***15-*** Bawerî
***17-*** Xelkên ji Sûriyeyê
***18-*** Pêşenga şoreşa Jin Jiyan Azadî a Rojhilatê Kurdistanê
***20-*** Semboleke berxwedana Kobanê
***23-*** Sembola welatan
***24-*** Tirmalên bilind
***27-*** Kar û xebat

## Bersiva hefteya borî



# Rojava li dor **'çîrokên hevpar'** civiya

## Gelek sînemager, çêker, derhêner û aktor beşdarî Mîhrîcana Fîlman a Navneteweyî ya Rojava bûn. Mihrîcanê careke din renginiya xebatên sînemayê nîşan da û di vê xaknîgariyê de çirûska hêvîyeke nû afirand

Xoşman Qado

Li bajarê Qamişloyê ya Bakur û Rojavayê Sûriyeyê, 5emîn Mihrîcana Fîlman a Navneteweyî ya Rojava bi coş û biryardariyeke mezin hat lidarxistin. Mihrîcana îsal diyarî 283 zarokên kurd hat kirin ku di Komkujiya Sînemaya Amûdê de jiyana xwe ji dest dabûn.

Mihrîcan 13ê mijdarê dest pê kir û heta 20ê mijdarê berdewam kir. Ev mihrîcan çalakiya sînemayî ya herî girîng a herêmê tê hesibandin û bi vegera mihrîcanê re piştî pênc salan, hebûna sînemayê xwe nû dike. Nexasim di jîngehek civakî û çandî de ku hem bi cihêrengî û hem jî bi zehmetiyan ve tê naskirin, wekî alavek ji bo berxwedana çandî û avakirina bîreweriya kolektîf e.

Mihrîcan bi temaya 'çîrokên hevpar, sînemaya azad' hat lidarxistin. Ev tema, cewherê projeya çandî ya ku mihrîcan hewl dide bi dest bixe dinasîne. Ji ber ku sînemaya Rojava li ser têgihek ku hunerê bi civakê ve girê dide tê avakirin.

Kesên ev mihrîcan li dar xist bawer dikin ku 'sînemaya azad' ne tenê gotinek e yan jî derbirînek hunerî ye; pratîkeke ku nirxbûyînê vedigerîne dengên gelên çewisandî û paşguhkirî. Her wiha çîrokên alternatîf li hemberî çîrokên serdestan diafirîne. Jixwe temaya îsal jî têkiliya mihrîcanê ya bi erdnîgarî û ramyariya Rojava nîşan dide.



**Veger û girîngiya demê**

Mihrîcana îsal piştî pênc salan hat lidarxistin. Ev jî gaveke çandî ya wêrek nîşan dide. Her wiha li herêmekê ku şert û mercên siyasî û ewlehiyê yên aloz hene, berdewamiya hebûna hunerê teqez dike.

Mihrîcan di salvegera bîranîna trajedîya Sînemaya Amûdê ya 1960î de dest pê kir. Bi rêya vê bîranînê, mihrîcan ne tenê qurbaniyan bi rêzdarî bi bîr tîne; di heman demê de vê bîranîna êşdar vediguherîne bangek ji bo berpirsyarî û hişyariyê. Ji bo avakirina têkiliyeke nû ya di navbera civak û sînemayê de, têkiliyek li ser ewlehî, azadî û rêzgirtina mafê xelkê di çandê de hatiye avakirin.

**Bername û çalakiyên mihrîcanê**

Li gorî komîteya amadekar, ji deverên cuda yên cîhanê nêzîkî 120 fîlm ji mihrîcanê re hatin şandin. 86 fîlm ji bo nîşandanê hatin hilbijartin. Fîlm li ser çend kategoriyan hatin belavkirin; fîlmên dirêj û kurtefîlm, belgefîlm. Her wiha berhemên serbixwe ji Sûriye, Kurdistan û Ewropayê...

Mijarên fîlman cur bi cur bûn. Di nav van mijaran de nasname, koçberî, rizgariya jinê, bandora şer û bîreweriya kolektîf hebûn. Her wiha rola jinan, hem bi hebûna derhênerên jin ên ciwan û hem jî bi fîlmên ku li ser ezmûn û berxwedana jinan disekinin, destnîşan kir.

Li gel nîşandana fîlman, semîner û panelên derbarê mijarên girêdayî sînemayê jî hatin lidarxistin. Her wiha 2 kargeh ji bo mijarên derhênertiya dîmen û çêkirina fîlman cihê xwe di nav bernameyê de girtin.

Gelek sînemager, çêker, derhêner û aktor beşdarî mihrîcanê bûn. Vê yekê hem rengîniya xebatên sînemayê nîşan da hem jî di vê xaknîgarê de çirûska hêviyeke nû ji bo Sûriyeyê afirand.

Mihrîcana Rojava nîşan da ku rola sînemayê ne tenê celebeyek şahiyê, di heman demê de kirineke berxwedanê û depoyek bîranînê ye jî.

Di navbera bîranîna trajediya rabirdûyê û pêşwazîkirina pêlek nû ya fîlmên serbixwe de, mihrîcan nîşan dide ku çîrokên hevpar dikarin cîhên ji bo diyalog û lihevhatinê biafirînin. Her wiha sînema dikare li cîhanekê bibe dengek alternatîf ku bi deng û pevçûnan tijî ye.

## Xelatên mihrîcanê




- ✓ ***Xelata başritîn a belgefîlman:*** All The Mountains Give/Arash Raksha
- ✓ ***Xelata baştirîn a kurtefîlman:*** Bint El Shelebiye/ Shero Heideri
- ✓ ***Xelata baştirîn a fîlmên kurdî:*** Hêvî/ Orhan Înce
- ✓ ***Xelata baştirîn a fîlmên navneteweyî:*** Xoftex/Noaz Desh
- ✓ ***Xelata beşa senaryoya dirêj:*** Bin Xet/Gulê Welat
- ✓ ***Xelata beşa senaryoya kurt:*** Deriyê Asêkirî/Nesrîn Farqîn
- ✓ ***Xelata Ş. Xelîl Dax a Sînemaya Azad:*** Hêza/Derya Denîz
- ✓ ***Xelata Rûmetê ya Jurî ya Taybet:*** Serê Kaniyê
- ✓ ***Xelata Menice Haco ya Jina Azad:*** Bottleneck/Anna Zêpa û Carlos Segundo
- ✓ ***Xelata Sirri Sureya Onder ya Demoqrasî û Mafê Mirovan:*** Ropewalker Memories/ Hamed Rajabi
- ✓ ***Xelata Ş. Mazdek Ararat ya Kedê:*** Rojbaş/Ozkan Kuçuk
- ✓ ***Xelata Taybet a Qasim Engîn a Bîrê:*** Rêzefîlma Vejîna Kurd

# Li Amedê dema mihrîcana fîlman e

Navenda Nûçeyan

Ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê û Akademiya Sînemayê ya Rojhilata Navîn û Sînebîrê dê 3yemîn Mihrîcana Fîlman a Amedê ya Navneteweyî were lidarxistin. Mihrîcan dê di navbera 7-14ê kanûnê de bi dirûşma "Dinya bi çîrokan tê ba hev" were lidarxistin û 84 fîlm dê werin pêşandan.

Li gel pêşandanên fîlman, her wiha dê di mihrîcanê de çalakiyên cuda jî bên lidarxistin; masterclass, xebatên atolyeyê, gotûbêjên bi beşdariya derhêner û komên fîlman.

Di mihrîcanê de fîlmên neteweyî û navneteweyî yên hatine hilbijartin jî dê bên nîşandan. Ji bo piştevaniya bi senaryoya fîlmên kurdî re dê 15 senaryoyên fîlman ji bo Fona Projeya Sînebîrê bikevin pêşbaziyê.

**Sînemaya kurdî**

Fîlmên dirêj, belgefîlm û kurtefîlmên di nava 8 salên dawî di sînemaya kurdî de derketin jî dê tê de cih bigirin. Di vê beşê de dê di heman demê de fîlmên kurdî yên di mihrîcanên cuda de hatine pêşandan jî cih bigirin.

**Dê xelat bên dayîn**

Ji bo piştevaniya bipêşxistina sînemaya kurdî re, ji bo teşwîqkirina

Di bin navê "Rêwîtiya Sînemaya Kurdî" de, 16 fîlmên dirêj ên neteweyî, 7 belgefîlm û 13 kurtefîlm dê bikevin pêşbaziyê. Di vê beşê de her wiha bernameyên pêşandanê yên cuda jî wê cih bigirin.

Yek ji aliyên din ên girîng ên mihrîcanê jî dê fîlmên tenê ne bi kurdî bin. Fîlmên serkeftî yên di sînemaya Tirkiye û cîhanê de jî dê bên pêşandan.

Di fîlmên navneteweyî de 10 fîlmên dirêj, 11 belgefîlm û 14 kurtefîlm dê bên pêşandan. Di vê beşê de her wiha dê bernameya masterclassê ya derhêner Kazim Oz a "Di sînemayê de derhênerî" û ya derhêner Touraj Aslanî ya "Ferqa di navbera nihêrtin û dîtinê de" bên lidarxistin. Li hêla din, dê bi beşdariya derhêner û komên fîlman gotûbêj bên lidarxistin.

nivîsandina senaryoyê dê 5 fîlmên dirêj, 5 belgefîlm û 5 kurtefîlmên ji bo Fona Projeya Sînebîrê hatine hilbijartin bikevin pêşbaziyê. Di dawiya mihrîcanê de ji her kategoriyê dê projeyek were xelatkirin.

Mihrîcan dê pêşangeha "Ji Rê" dest pê bike. Di pêşangeha têkel a li ser serpêhatiya fîlmê "Rê (Yol)" ê Yilmaz Guney hatiye avakirin dê cih bidin xebatên gelek hunermendên girîng. Fîlmê ewil ê mihrîcanê jî dê belgefîlma "Kardeş Turkulerê" ya Çayan Demîrel û Ayşe Çetînbaş be.




Li gel eywanên Navenda Kongreyê ya Çand Amedê, her wiha dê li Şanoya Bajar a Amedê û li eywanên sînemayê ya Ceylan AVM'ê bên nîşandan.

**Xebatên atolyeyê**

Di çarçoveya mihrîcanê de dê 3 atolye bên lidarxistin. Sernavên atolyeyan ev in:

- ✓ Derhêner Arîn Înan Arslan / Sînemaya Kurdî: Kameraya bênavend a erdnîgariya jihevbelavbûyî
- ✓ Hulya Ugur Tanriover / Vegotina çîrokên xwe ya bi zimanê xwe: Sînemaya jinan
- ✓ Ayşe Çetînbaş / Produktoriya belgefîlmên serbixwe

Di mihrîcanê de her wiha bi moderatoriya Evrîm Kayayê panela bi sernavê "Fanon 100 salî ye" wê were lidarxistin. Dilawer Zeraq, Hakan Araş û Ezgî Duman dê weke axêver tev li bibin.

Cebraîl Vûral

# Mêvanperweriya kurdan

Me di nivîsara xwe ya berî vê de, qala çanda kurdan a dawetê kiribû. De îcar ji ber ku têkiliyeke dawetê û mêvanperweriyê jî bi hev heye, em ê di vê nivîsara xwe de qala mêvanperweriya kurdan a kevn û nû bikin.

Kurd, di tevahiya dîrokê de, bi mêvanperweriya xwe tên nasîn; her hêza ku ji derve dageriyaye Kurdistanê, berê qala mêrxasî û mêvanperweriya kurdan kiriye, lê ji ber ku kurd pir saf bûn û gelek caran bi xiyaneta kes û komên xayîn re rû bi rû mane, di pêvejoya dîrokê de baweriya kurdan a bi mêvanan, hêdî hêdî şikiyaye, yan jî guman tê geriyaye...

Em dikarin ji mêvanperweriya kurdan a di dawetan de dest bi mijara xwe bikin. Berê wexta ku dawet li dar diketin û mêvanên berbû ji derve dihatin, her maleke kurd çend mêvan êvarê dibirin mala xwe, ji wan re xizmet dikirin û çanda xwe ya mêvanperwer nîşan didan. Di wan rojên werê de hema mirov dikare bibêje her mala kurdan digot 'de ka bê kî bok e, kî beran e'! Yanî her maleke kurd, mêvanperweriyeke wisa dikir ku kengî ew mêvan bihatana wî gundî ya jî bajarî, berê sola wan bêhemd diket wan mazûvanên kevn!..

A rast, niha jî mirov rastî wan şopên wê mêvanperweriya kevn tê, lê pir qels bûye û ya heyî jî tijî hesab, fen û fût in, axir ti kurd, êdî ji kêfî û bêhesab mêvanan nabe mala xwe!..

Berê, xwediyê malê, êvarê li ba mêvanên xwe vediket, lê niha, xwediyê malê, ciyê mêvanan datîne û derbasî odeya xwe ya zavatiyê dibe; sibehê dereng mazûvan, tê ciyê xwe li ba mêvanan çêdike, weyla guro hejaro!

Ma qet pêwîst e ku em bibêjin ev kirinên nû ne jî çanda me ne? Axir em bi awayekî şaşwaz vê çanda riziyayî ya civaka sermayedar a mala yekta dibînin û pê dikeribin.

Aha ew şêla zava û bûkê ya ku me di mijara dawetê de qal kiribû bêhna xwe daye çanda mêvanperweriyê jî!..

xwebûn

1 - 7 Kanûn 2025 / e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 311

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Adar Gulan, Heval Dilbihar, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco, Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Kurt İsmail Paşa 2 Sk. Güneş Plaza No 18/5 **Yenişehir-Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

Ji bo abonetiyê
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Bi tahm û nirxên xwe yên bêhempa: Fistiqên Sêrtê



Serdar Altan

Yek ji herêma xweş û navdar ên Kurdistanê herêma Sêrtê ye. Bajarê Sêrtê wek tê zanîn bi gelek nebatên xwe yên xwezayî tê naskirin. Yek ji van nebatên tahmxweş û hêja jî fisteq e. Weke tê zanîn li hin deverên din ên Kurdistanê jî hilberîna fisteqan heye helbet. Yek ji van deverên navdar Dîlok e. Her wiha li Rihayê jî hilberîna fisteqan heye û her ku diçe zêde dibe. Lê belê fisteqên Sêrtê bi tevahî ji van fisteqan cuda ne. Hem bi şikl û şemalê xwe, hem jî bi tahma xwe naşibe fisteqên Dîlokê.

Bajarê Sêrtê bi taybetî ji bo çandina fisteqan herêmeke pir guncav e. Herêm bi avhewayek karasayî tê nasîn ku havînên wê germ û zuha û zivistanên wê sar û bişilî ne. Erdên herêmê bi gelemperî bikirêc û qilêbar in û ji bo çandiniya nebatan xweyî mercên dijwar e.

Herêm bi du çemên sereke û navdar, çemê Botan û çemê Başura tê avdan. Bi vî awayî, yek ji herêmên girîng ên avberê ye. Havînên germ û zuha û nemiya kêm, mercên xweş ji bo geşbûna fisteqên Sêrtê diafirîne. Avhewa çolê ya herêma Sêrtê û nemiya kêm dibe sedema ku geşbûna fisteqan baştir be û tahma wan xweştir bibe. Ji ber vê yekê li piraniya herêmê fisteq tên çandin. Şêniyên herêmê debara xwe bi fisteqan dikin. Lê belê wek tê zanîn di van salên dawî de bendava Ilisuyê hat çekirin û yek ji herêmên ku ji vê bendavê bandor bû herêma Sêrtê ye. Niha fikar ew e ku hebûna vê bendavê dê bandorê li avhewaya herêmê bike û zirarê bide nebatên weke fisteq û hin cure nebatên din.

### Dîroka fisteqên Sêrtê

Wekî her nebat û darekê, darên fisteqan jî di mehên biharê de kulîlk vedidin. Di germa havînê de hundirê qalikan bi fisteqan tijê dibe û di destpêka meha îlonê de êdî dema çinîna wê tê. Beriya em derbasî hurgiliyên çandin û çinîna fisteqan bibin, werin em berê xwe bidin dîroka çandina fisteqan li herêma Sêrtê.

Dîroka fisteqê heya topaxên bereketdar ên Mezopotamyayê digihîje û lêkolînên arkeolojîk nîşan didin ku di demên Asûr û Babilan de li vê herêmê fisteq hatine çandin. Berî cureya fisteqê Sêrtê, li vê herêmê bi hejmara kêm be jî fisteqên Dîlokê û Helepê hatine çandin. Cureyê fisteqê Sêrtê cara pêşî destpêka sedsala 1900an, ji Îranê hatiye anîn. Dibe xwînerên me jî zanibin; fisteqên Îranê jî bi hin awayan dişibin fisteqên Sêrtê.

Di 700 salên dawî de jî tê gotin ku fisteqê Sêrtê yek ji xwarinên herî balkêş ên sifreyên qesr û qonaxan bûye. Lê helbet di sedsala dawî de hebûna vê fisteqê bêhtir xuya dibe. Dema welatiyên derveyî Sêrtê jî pê hesiyan ku nebatek wisa bêhempa li vê herêmê heye, ev xurek bêhtir bala mirovan kişand.



> Dema berê mirov dikeve bajarê Sêrtê yek ji tiştên ku destpêkê dikeve bîra mirov fisteq in. Li bazarê hûn rastî gelek dikanên fisteqfiroşan tên. Buhayê wan gelek zêde be jî, her welatiyek teqez ji bo ku xwe bigihîne vê tahmê dilxwaz e. Jixwe dema tu fisteqan dibînî êdî ne buhayê wê, ne tiştekî din yê neyînî li bîra mirov namîne. Lewma fisteqên Sêrte nebateke gelekî taybet û newaze ye



### Taybetiyên wê

Fisteqê Sêrtê ji fisteqên din bêhtir gir û rengê wî zêdetir kesk e. Bi hebûna qalikê xwe yê zirav bi hêsanî tê vekirin û tê xwarin. Tahma wî ji fisteqê Dîlokê cuda ye û ji bo xwarinê bi taybetî tê tercîhkirin.

Sê cure fisteqêm Sêrtê hene: fisteqê navincî (kalîteya yekemîn), fisteqê pense (kalîteya duyemîn) û fisteqê girtî (kalîteya sêyemîn). Fisteqê kalîteya yekemîn weke çerez tê xwarin, lê fisteqên kalîteya 2-3 ji bo çêkirina helaw û şêraniyên din tên bikaranîn.

Darên fisteqan li nav erdên bê bere, bikirêc û bêfeyde mezin dibin. Lê di mercên erdên berfirehî û hêsandar de, bi avdaniya guncav û bi çandina guncav a cureyên nêr-mê, hilberînek zêde û bikalîte tê bidestxistin.

Fisteqê Sêrtê ji aliyê madeyên mineralî ve gelek dewlemend e. Di 100 gramên fisteqê Sêrtê de 131 milîgram kalsiyûm heye. Di nav xwe de vîtamînên A, E, C, B, B1, B6 dihewîne û depoyeke mezin a proteînê ye.

Bi taybetî ji bo kesên ku rîska nexweşiyên dil û xwînê heye, di diyeta wan de bi kêr tê.



Rîtma dil û xwînê baş dike, tundiya damaran diparêze, kolesterolê bi rêkûpêk dike û pergala parastinê bihêz dike. 100 gram fisteqê Sêrtê 500 kalorî dihewîne û ne weke fisteqê Dîlokê bi rûn û kalorî ye.

### 12 mîlyon dar

Hilberîna mezin a fisteqên Sêrtê li navçeyên Tîllo, Şêrwan, Dihê bêhtir e. Lê belê van salên dawî, li navçeyên din ên weke Misirc û Hawêlê jî belav bûye. Avhewaya van herêman ji bo çandina fisteqê guncav e û berhem bi rêjeya herî bilind tê bidestxistin.

Sala 2025an, li hemû Sêrtê li ser 409 hezar dekar 27 hezar 252 ton berhem hatiye berhevkirin. Berî 20 salan deverên çandiniyê 45 hezar dekar bû, îro gihîştiye 410 hezar dekaran. Hejmara darên fisteqan ji 12 milyonan derbas bûye.

### Karên li gorî demsalan

Niha jî em hinekî berê xwe bidinê bê ka ev nebata tahmxweş di nav salê de çawa tê xwedî kirin. Li gorî agahiyên lêkolînî, di meha çileyê de dema goberkirina jêrîn e. Di werza biharê de kulîlkvedan û mezinbûn pêk tê, havînê jî fêkî di goşiyan de xwe didin xuyakirin. Di payîzê de berhem tê berhevkirin û fisteq tên amadekirin ji bo firotinê.

Darên fistiqan wekî darên mê û yên nêr ji hev vediqetin. Darên nêr bi tu awayî fêkiyan nadin. Her çiqas kulîlk vedin û wekî fêkiyekê xuya bikin jî hundirê hemû goşiyan pûç e. Lê belê çiqilên darên mê wexta bi darên nêr ve tên temandin, ango aşîkirin û ew çiqil mezin dibin ji nû ve hundirê goşiyên darên nêr jî tije dibin û fêkî digirin.

Di fisteqan de fêkî di nav goşiyan de cih digirin û hemû fêkiyên li ser goşiyan di heman demê de xame nabin. Xamebûn pêşî li serê goşiyê dest pê dike. Bi gelemperî mêweyên yekemîn xame dibin berî dema berhevkirinê ji darê dikevin erdê. Ev mêweyên ku di binê darê de li ber siyê zuha dibin, zêdetir balkêş û bitahm in.

Ger rengê qalikên fisteqan dest bi vebûnê kiribe û fisteqên di nav de hişk bûbin, ev tê wê wateyê ku dema berhevkirinê hatiye. Dema ku ji sedî 1-3 libên wan dikevin binê darê, wê demê mirov dikare dest bi berhevkirinê bike.

Pêvajoya xamebûna fisteqan di nîvê havînê de dest pê dike û heta dawiya havînê berdewam dike. Di van mehan de rengê qalikên fisteqan ji kejbûnê vedigere qehwebûnê.

### Dema berhevkirinê

Fisteq pêşî destpêka tebaxê wekî "bekleweyî" an jî "boz" tê berhevkirin. Ev dema hanê 15-20 rojan berdewam dike. Paşê fisteq dest bi xamebûnê dike û sor dibe, ji nîvê îlonê heta dawiyê tê berhevkirin.

Di nîvê tebaxê de dest bi berhevkirina fisteqên boz tê kirin ku ji bo çêkirina bekleweyê tê bikaranîn. Di destpêka îlonê de jî fisteqên sor ên qalikên sor tên berhevkirin. Dema berhevkirinê bi gelemperî di dawiya îlonê û destpêka cotmehê de ye.



### Şêwaza berhevkirinê

Berhevkirina fisteqê bi jidarvekirina goşiyan dest pê dike. Di dema berhevkirinê de pêşî mêweyên ku ketibin erdê tên berhevkirin. Paşê li binê daran çarşefên mezin tên vekirin û bi alîkariya sêlimê berhevkirin dest pê dike.

Karkerên ku sibe zû dê biçin berhevkirina fisteqan, li ber germahiya ku digihîje 40 dereceyan nêzîkî 12 saetan dixebitin. Li vir piranî kar bi rêbaza komelî (komun) tê kirin û ev yek vî karê hêsantir dike.

Fisteqên ku hatine berhevkirin bi sindoq û telîsan tên veguhastin ji bo bênderan. Çewalên plastîk nayên bikaranîn. Ji ber ku ew germahiya mêweyan zêde dike. Ger mêweyên terr di nav telîsan de demeke dirêj bimînin, di demeke kurt de divê bi ben werin girêdan.

### Pêvajoya fabrîkasyonê

***Piştî ku fisteq ji zeviyan tê berhevkirin, di kargehan de bi baldarî ji bo xwarinê tên amadekirin. Ev pêvajo wiha ye;***

- Fisteq pêşî di makîneyan de tên şûştin û qalikên wan tên jêkirin.
- Piştî şûştinê fisteq weke yên tije û vala têne veqetandin û her wiha li gor libên baş û xirab jî tên neqandin. Yên bikalîte tên hilbijartin.
- Berhemên bikalîte tên hilbijartin û di cihên zuhakirinê de tên raxistin. Li vir bi rêbazên xwezayî tên zuhakirin. Ger mêweyên terr ji qalikên wan ên sor werin veqetandin û wekî kavlak werin zuhakirin, rengê qalikên wan zêdetir spî dibe û derfeta vebûna qalikan berfirehtir dibe. Bi vî rengî kalîte bilind dibe.
- Piştî zuhakirinê, fisteq dîsa tên neqandin û ev car dora pakêtkirinê tê. Fisteqê Sêrtê hem di bazara navxweyî de tê firotin hem jî ji bo derveyî welat tê îxrackirin.

Li Sêrtê ji bo hilberîna fisteqan ku 9 hezar malbat pê debara xwe dikin, bi hevkariya Yekîtiya Ewropayê projeyek bi 10 milyon awroyî hat pêkanîn û kargeha hilberîna fisteqan a herî mezin a Ewropayê li Sêrtê hat avakirin. Ev kargeh her wiha di cîhanê de kargeha sêyemîn e.

Li kargehê xizmetên weke jêvekirina qalikan, veqetandina vala/tijî, veqetandina yên vebûyî, pakêtkirin û depokirinê tên dayîn.

### Deriyê debarê

Fisteqê Sêrtê bi aromayek bilind û bi tahma xwe ya xweş ji hemû deverên Kurdistan û Tirkiyeyê tê xwestin û feydeyeke mezin li aboriya herêmê dike. Zêdetirî nîvê xelkê Sêrtê bi hilberîna fisteqan jiyana xwe debar dike. Bajarê Sêrtê bi vî awayî pêşengiyeke mezin di vî warî de dike.

Fisteqê Sêrtê ne tenê hilberîneke çandiniyê ye; ew xebata dema berê, tahma îro û mîrateya pêşerojê ye.

Dema ku cihê xwe li ser sifrayan dibîne, hêvî û qazancê ji bo xelkê herêmê bi xwe re tîne. Bi tahm û nirxên xwe yên bêhempa, fisteqê Sêrtê bi destbirakiya hinarên Zivzîk û petêxên Cefanê, vê herêmê dike weke herêmeke nebatên tahmxweş. Careke din em dibînin ku xweza çiqas bi bereket e û ev bereketa hanê ji bo mirovahiyê çiqas girîng e.